


Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkîyê“

III.3.A. Mijarên ku li Tirkîye tevgerên jinan ji hev cihê dîkin û dîkin yek

Aslı Polatdemir

Îlon 2017



III.3.A. Mijarên ku li Tirkiyê tevgerên jinan ji hev cihê dikin û dikin yek

Di encama analîzkirina hevpeyvînan de, ji bo ku piraîbuna tevgerên jinan a li Tirkiyê derkeve holê, li dû hewldanên nexşekirina komên cuda, di vî beşê de li ser pirsê lêkolînê ya navendî dê wêre sekinandin: Tevgerên jinan bi cudahiyên xwe yê helwesta siyasî, ligel cudahiyên xwe dikarin bi hev re kar bikin? Tevgerên jinan di kîjan pîvanî de dikarin bi hev re bixebitin? Kîjan kom di kîjan mijar û beşan de ji hev dûr disekin?

1.1 Mijarên ji hev cihê dikin

Tevgerên jinên Tirkiyê tevî cîherengiyên xwe mînakên koalîsyonên girîng didin xuya kirin ku di xeta têkoşîna hevpar da piştgirî gengaz e. Mixabin di hinek xalan de li darxistina piştgiriye de hin astengî dikarin derkevin. Li gorî Güler İpeka ji Komeleya Jinan a Ked tu yî *Emek Sensin Kadın Derneği*, ku di çarçoveya karê malê de li bajarê Trabzonê karê xwe dimeşînin, „di mijarê mafên jinan de, mijarên jinan de, jin ji kîjan bajarê dibin bila bibin, ji kîjan heremê dibin bila bibin, dikarin bi hev re bin, lê mixabin dema ku cudakirina siyasî etnîkî dibe mijar, ji hev cuda dibin.“ (İpek 2015: 34)¹ Li ser esasa daneyên di encama hevpeyvînanê de direj ên di çarçoveya ve lekolînê de derketin holê de, mijarên dibin sedema nîqaş û gengeşiyê ev in: Cudahiyên bîrdozî, etnîsîte, ol/bawerî-muhafezekarî, zayendî/zayend (-a civakî)/nasnameya zayendî, cudahiyên rêxistinî/sazî. Ev mijar di çarçoveya vê sernivîsê de li jêr tîst dest girtin.

Cudahiyên bîrdozî

Di ronahîya daneyên ku bi hevpeyvînanê pîsporan bi dest ketin de ceribandina nexşeya tevgerên jinan a Tirkiyê hatibû çêkirin.² Di hevpeyvînanê pîsporan de cudahiyên îdeolojîk mîna hêmanekî cudakêr di navbera tevgerên jinan a Tirkiyê de wek sernivîsek hat zimên. Di vî beşê de dê li ser cudahiyên bîrdozî bê sekinandin û rola wan a di navbera tevgerên jinan de, ên ku xwedî seknên cuda ne, were nirxandin. Encamên ku di bin sernivîsê „etnîsîte, ol /

¹ „Kadın hakları konusunda, kadınlarla ilgili konularda, kadınlar hangi ilde olursa olsun, hangi yörede olursa olsun, hep beraber olabiliyor ama siyasi ve etnik ayrımcılık için içine girdiği zaman ayrılabilirler.“

² Di raporê de li nivîsa III.2.A. „di Qadên lekolînê de mînakên Tevgerên Jinan a li Tirkiyê“ binêrin (Polatdemir 2017).

muhafezekarî, zayendî (zayenda civakî) / nasnameya zayendî, cudahiyên rêxistinî / sazî“ de hatin analiz kirin û nirxandin, dikarin wek berdawama vê mijarê bèn xwendin. Di vî beşî de dê li ser tevgerên jinan ên xwedî bîrdoziyên û nêrînên siyasî yên cuda ne, di kîjan xalan de helwestên ji hev cuda nişan didin, bèn rawestin.

Li bajarên ku lêkolîn hatin kirin û bi pisporan re hevpeyvîn hatin çêkirin, çalakvan û akademisyen balê dikişinin ser nêrînên bîrdozî û siyasî, ku di navbera tevgerên jinan de carcaran dibin sedema helwestên cuda an jî ji hev cihê bûnê (mînak Arıcı & Anonim 2015: 33; Ersöz û yên din 2015: 64). Di vê cihê bûnê û pozîsyonên cuda de pênaseyên siyasî gelek girîng in. Li gorî Adalet Aydın ji Partiya Demokratîk a Gelan HDP ya bajarê Muğlayê „çawa ku her zîlam li gorî dîtina xwe ya siyasî bandor dibe, her jin jî li gorî dîtina xwe ya siyasî bandor dibe.“ (Aydın 2015: 24)³ Aydın weha berdewam dike: „çawa ku jinên di bin sîwana CHP de sîyasetê dikin dibêjin ‚yê mafê herî mezin daye jinan Mustafa Kemal Atatürk e‘ û xwe li ser vî esasî rêxistin dikin, jinen din jî dikarin ji xwe re rêberekî din bibînin.“ (Aydın 2015: 24)⁴ Ji KAMER’a bajarê Diyarbekirê Nebahat Akkoç jî, weki nunera sazîyeke serbixwe ya heremê, cudahîya îdeolojîyan wek mînak li jêr tîne ziman:

Dibe ku ji ber sedema pênaseyeke siyasî ya ji aliye rêxistinên jinan ên nêzî Tevgera Kurd ve hatiye danîn, têkîlî bèn qut kirin, ji ber ku [...] hemî tekst hemî xebat bi ‚Reberê me‘ dest pê dikin, tu jî wek sazîyeke serbixwe nikarî tê de cihê xwe bigirî. (Akkoç 2015: 57)⁵

Li gorî aktîvistên jinên ji Platforma Piştgiriya bi Jinan a bajarê Denizliyê „gelek avesaziyên îdeolojîk di nav xwe da tevgera jinan dihewînin“⁶ Di asta partîyen siyasî de „li gor îdeolojîya AKP an ji MHP [...] tekoşîna jinê heyê.“ (Anonîm 2015: 82)⁷ Jinên platformê weki mînak xebata komên jinan ên ku li gorî îdeolojiya AKP tekoşîna dimeşînin tînin ziman; AKP weki partîya hikumetê li gorî „îdeolojiya xwe ya muhafezekar“ di nav partiyê de bi jinên ku helwesta „rola

³ „Nasıl her erkek kendi siyasi görüşüne göre etkileniyorsa, her kadın da kendi siyasi görüşüne göre etkileniyor.“

⁴ „CHP çatısı altında siyaset yapan kadınlar nasıl ‚Kadına en büyük hakkı Mustafa Kemal Atatürk vermiştir‘ söylemi üzerinden kendilerini örgütlüyorsa, başka kadın hareketleri de kendilerine başka bir öncü bulabilir.“

⁵ „Kürt hareketine yakın kadın kuruluşlarının ortaya koyduğu bir siyasi tanım nedeni ile kopabilir çünkü [...] ‚Önderimiz‘ diye başlar bütün metinler, bütün çalışmalar; onun içine giremiyorsun sen bağımsız bir kadın kuruluşu olarak“

⁶ „Birçok ideolojik yapı kendi bünyesinde [...] kadın hareketini bulunduruyor.“

⁷ „AKP’nin ya da MHP’nin kendi ideolojisinde [...] kadın mücadeleleri var.“

jintiyê, dayîkbûn“ dipejirînin, dixebite (Anonîm 2015: 82). Li gorî Bilsen Özen, endama Konseya Jinan a bajarê Denizliyê jî, him li tevahîya welêt, him jî li herema Denizliyê sîyaset û îdeolojiyên cuda jinan ji hev cihê dike û weha berdewam dike „di tevgerên jinan de [...] [ne] polîtîkayên dewletê, jin giraniya xwe dide“⁸, wekî konsey ew dixwazin vê cudabûnê ji holê rakin (Özen 2015: 60- 72, 83- 93). Li gorî Bilsen Özen ev ramanên cuda ku bingehên xwe ji îdeolojiyan digirin, dikarin bi şikandina pêşdaraziyên ji holê rabin. Dîsa li gorî ramanên Özen şîdeta li ser jinê ji daxuyaniyên hikumetê serbixwetir pêk tên û ev pirsgirêk bi perwerdekirina jinê dikare bê guhertin (Özen 2015: 83- 93).

Li gorî van nêrînan, jinbûn wêdetirê cudahiyan îdeolojîk, wek hevkarîyeke derdikeve pêş. Ji Navenda Jinan Kardelenê ya bajarê Dîyarbekirê Mukaddes Alataş girîngiya zanebûna jinên di nava sîyasetê, ya di derbarê mijarên jinê û zayenda civakî de tîne zimên:

[...] Bi çendî dikarî hejmara jinan zêde bikî, ger di TBMM'ê de 500 endamên meclîse hebin, dema tu bikî 250 jin û 250 zilam, wê demê tu di rastiye de jinan dişînî meclîsê? An jî li wir di nava van 250 jinê de pêwîstî bi jinên ku xwedî hişmendîya jinê, zanebûna jinê, sekna jinê, li hemberî zilam, ji daxuyaniyên zilamtiyê bigire, heta li hemberî qanûnên ku derdikevin bi perspektîfa jinê bisekine û bibêje „jin li ku dera vê qanûnê ye?“ heye? An na pêwîstî bi jinekê ku bi hejmar li wir be, li wir rûnê [...] girmikê xwe li mase bixîne û serokê partiyê [...] çi bibêje li dû wî bisekine, nin e. (Alataş 2015: 23)⁹

Cudahiya îdeolojîk, pênasayên siyasî yê cuda bandor li ser tevgerên jinan, ango di pênasikirina nasnameya xwe de, dîyarkirina xeta tekoşînê de, di çarçoveya polîtîkaya jin û civaka zayendî de, dike. Pevçûnên îdeolojîk, nîqaşên siyasî, ji ber sedema bandorên xwe yê bi hêz li ser têkiliyên tevgerên jinan, wek mînak di mijarên cuda de hatina gel hev û pevajojên diyalogê, bandorê dike. Xeta esasî ya seknên îdeolojîk di tekoşîna jinan de xalekê cudakir e.

⁸ „Kadın hareketlerinde [...] devlet politikası [değil] kadın ağır basar.“

⁹ „[...] Nicel olarak kadın sayısını arttırırsın, mecliste TBMM'nde 500 tane meclis üyesi varsa, 250 kadın 250 erkek yaptığında, gerçekten sen kadınları meclise taşımış mı oluyorsun? Yoksa bu 250 kadında kadın farkındalığı, kadın bilinci, kadın gibi duran, orada erkeklere karşı gerçekten erkekliğin verdiği demecten tutalım da, çıkabilecek yasalara kadın bakış açısıyla, kadınlar bunun neresinde duruyorlar diyen kadınlara mı ihtiyaç vardır? Yoksa sayıca orada durup [...] masaya yumruğunu vurup, kendi [...] parti başkanının ya da liderin [...] ne söylüyorsa onun arkasında duran bir kadına ihtiyaç yoktur.“

Etnîsîte

Di lêkolînê de nîqaşên herî girîng di mijara nasnameya kêmetewa herî mezin a Tirkiyê Kurdan de, di bin sernivîsa etnîsîteyê de hatin kod kirin û nirxandin. Tevgerên jinan ên ku di çarçoveya polîtîkayên jin û zayenda civakî de tîne cem hev, di mijara polîtîkayên nasnameya etnîkî de, taybetî girêdayî Tevgera Kurd de, seknên cuda nişan didin. Ji Komeleya Piştgiya bi Namzetên Jin, Hatice Kapusuz Kütük tîne ziman ku „di mijarên wek polîtîkayeke gelemperî, nezikatiyeke demokrasiye ya giştî“¹⁰ de tevgerên jin li hev nakin û balê dikişîne ser „tevgerbûna jinê ya tevgera Kurd“. Li gorî wê xalên ku ev tevger diparêzin, ji bo „tevgerên jinan ên li rojavayê welêt dibe nakokîyekê, bi xetên wan ên sor“¹¹ dikeve (Kapusuz Kütük 2014: 23). Mijarên ku Tevgera Jinên Kurd di çarçoveya polîtîkayên etnîkî da tîne zimên; hemwelatîyeke hevpar, naskirina cudahîyên çandî, mafê perwerdeya zimanê zikmakî û beramberê vê xebatên bi „Tevgera Kurd“ re li ser xeta „tekoşina netewî“ tîne meşandin, ji alîyê pisporan ve wek xalên ku tevgerên jinan ên li Tirkiyê ji hev cuda dikin, hatin dest nişan kirin (mînak: Başak 2014: 48; Üstün 2014: 32; Cön 2015: 22; Çiçek & Gülen 2015: 36; Şahin Güngör 2015: 30; Üst 2015: 14).

Li gorî dîtinên pisporan di nav tevgerên jinan ên Tirkiyê de yek ji mijarê ku herî zêde li ser nîqaşê tê kirin, di çalakîyan de bikaranîna diruşmeyên bi zimanê Kurdî ne (mînak: Anonim 2015: 43; Ülker 2014: 30; Üst 2015: 14). Sema Kendirici Uğurman ji Yekitîya Jinên Tirk a bajarê Enqerê li ser rewşa ku di çalakîya Zagona Cezayê Tirk (TCK) de ji ber slogana Kurdî hatiye jiyandin kirin, bi vî awayî tîne ziman:

Wekî mînak [...] di guhertina TCK de dîsa me mîting çêkir, ewê bê dengdayîn, ew roj dê bê deng dan, ji bo me rojeke gelek girîng e. [...] Emê ji Kizilayê ber bi meclîsê ve bimeşin. [...] rewşeke gelek girîng e. Em dixwazin mesajekê bidin yê li hundir. Em hatin cem hev. Belevoka me heye. Me belavokê xwend.[...] Li wir rexistîneke derket got ku [...] „Em dixwazin bila Kurdî jî were xwendin!“ Hîn em bi aweyekî aramî nav xwe de nîqaş dikin, ka gelo em

¹⁰ „Genel bir politika, genel bir demokrasi anlayışı [...] gibi konularda“

¹¹ „Batıdaki kadın örgütlenmelerinin bam telleri, kırmızı çizgileri“

bixwînin, an jî na, rexistinekê din hat got ,ger hûn bi Kurdî bixwînin ez nikarim li cem we bisekinim' [...], em cîh hiştin çû. [...]ango wisa, gelek pêwîst e [...]. Berî sê salan di derbarê kurtajê de gelek nîqaş derketin, disa li wir [...] di destê me de afîş [hene] li wir [di afîşê de] Kurdî binivîsîne an jî Tirkî binivîsîne, ger em dibêjin ,ji jinê re azadî, dest nede bedena min' [...] çî girîngiya wî heye, bi kîjan zimanî hatîye nivîsandin? Ji ber ku li wir [bi zimanê Kurdî dûrîşme] nivîsandî bû, hin kes [civînê] hiştin û çûn [...], wek vê[...]. Divê mirov ji gelek cihekê cuda li mijara jinê binere. (Kendirici Uğurman 2014: 23)¹²

Berdeвка Yekitîya Jinen Tirk Kendirici Uğurman, ku hin lêkolîner û aktîvîst wê wekî Kemalîst¹³ binav dikan, di çalakiya li hemberî Zagona Cezayê Tirk de, ku hemu jinên li Tirkiyê eleqadar dike, bê şik xwendina belevoka bi Kurdî red nake, kêmanî dixwaze li ser were nîqaş kirin, lê belê hin komên din beyî li ser were nîqaş kirin ji çalakîya koalîsyonê xwe dikişînin. Di heman demî de ji Partîya Demokratîk a Gelan (HDP) a bajarê Muglayê Adalet Aydın di çalakiyên derbarê polîtîkayên jinan de, mijara bikaranîna zimanê Kurdi û diruşmeyên Kurdî de tecrubeyên xwe yê li Herema Egeyê weha tîne ziman:

wek mînak [em] dibêjin „Jin Jiyan Azadî“ [...] minak hinek jin li hemberî gotina „Jin Jiyan Azadî“ derketin. Ev ji çî ye? Ango dixwazin çî bibêjin? Bi zimanekî ku ez nizamim lê belê yekî din baş dizane em dibêjin „Jin Jiyan Azadî“, lê mixabîn ji ber ku siyaseta ew jê tê li dûrî „Tevgera Azadîya Kurd“ e, li hemberî vê slogana ku bi zimanê [Kurdî] tê avêtin disekine. Mînak ev pirsgirêkeke esasî ye. (Aydın 2015: 24)¹⁴

¹² „Mesela [...] TCK değişikliği sırasında yine bir miting yaptık, mecliste onaylanacak, o gün oylanacak, bizim için çok önemli bir gün [...]. Kızılay'dan meclise yürüyeceğiz. [...] Çok hayati bir durum. İçeridekilere mesaj vermeye uğraşıyoruz. Bir araya geldik. Bir bildirimiz var. Bildiriyi okuduk [...]. Orada bir örgüt çıktı dedi ki [...] ,Biz Kürtçe de okunsun istiyoruz!' [...]. Biz hani yapar mıyız yapmaz mıyız diye çok sakın tartışırken, bir başka örgüt geldi dedi ki ,Eğer Kürtçe okuyacaksanız ben sizin yanınızda duramam' [...], bıraktı gitti bizi. [...] Yani böyle çok önemli işte [...]. 3 yıl önce [...] kürtajla ilgili çok [...] tartışmalar çıktı, orada yine [...] elimizde afiş... Orada [...] Kürtçe yazsa ya da Türkçe yazsa, kadına özgürlük diyorsak, bede kürtajla nine dokunma diyorsak [...], hangi dilde yazıldığı önemli mi? Ama orada o yazılı olduğu için (Kürtçe dilindeki sloganlar kastediliyor) bırakıp gidenler oldu, gibi. [...] Çok farklı bir yerden bakmak gerekiyor kadın meselesine.“

¹³ Ji bo agahîyên berfirehtir li nivîsa III.2.A. „Di qadên lekolînê de mînakên tevgerên Jinan ên li Tirkiyê“ (Polatdemir 2017) binêrin.

¹⁴ „Biz [...] ,Jin Jiyan Azadî' diyoruz mesela, ,Kadın Yaşam Özgürlük' diyoruz. Mesela bu ,Jin Jiyan Azadî' lafına karşı duran kadınlar çıkabildi. Bu neden? Yani aslında ne söyleniyor? Benim bilmediğim ama birisinin çok iyi bildiği bir dilden biz ,Kadın Yaşam Özgürlük' diyoruz, ama onun geldiği siyasi yapı, ,Kürt özgürlük mücadelesi'ne mesafeli

Di çalakîyekê ku li qada raya giştî pêk tê de, biryarên bikaranîna zimên him ji bo naskirina komekê dibe pirsekî esasî, him jî di warê polîtîkayên jinan ên hevpar hatine lidar xistin de dibe cîhê dawxaziya naskirina komeke etnîkî. Zimanê Kurdî – wekî ku di beşa van herdû hevpeyvînan de jî tê dîtin – li Tirkiyê mîna nîşaneyê nasnameya polîtîk tevî nasnameyên jinan derdikeve holê.

Ji zanîngeha Enqerê Serpîl Sancar jî xeta vekêşanê ya navbera Tevgera Jinên Kurd û Tevgera Femînîst bi taybetî li ser rexneyên ku Tevgera Jinên Kurd li ser esasa „pratîka çewsandineke cuda“ (Sancar 2014: 34)¹⁵, ya jina Kurd li Tevgera Femînîst dike, digire dest:

Li alîyê din di navbera Tevgera Jinên Kurd û Tevgera Femînîst de xetên vekêşanê yên girîng hene. Ango Tevgera Femînîst li Tirkiyê kêma zêde [...] ji nêzikatiyên Kemalîzm, Atatürkparêzî an jî modernbûnê derketiye, mirov dikare bibêje wek zarokên wan an jî neviyên wan e. Zêdetir [ji] pola navîn in, [...] zêdetir Tirk, anga Atatürkparêz, Kemalîst, perspektîfekê modernîst heye di hin rêxistinên mafên jinan de. [...] Rexneyên girîng ên Tevgera Jinên Kurd [...] [ku dibêje] jinên Kurd pratîkeke çewsandinê ya cuda jiyan dikin, hene. Bi rastî ev jî tiştên gelek pêwîst [bûn] û aso vekirin. Ango di salên 90'î de 2000'an de gelek femînîst li ser van rexneyan sekinîn û [...] Tevgera Jinên Kurd û rexistinen femînîst dest bi gelek xebatên bi hev re kirin. (Sancar 2014: 34)¹⁶

Li gorî Sancar di navbera femînîstan de jî cudahî heye, lê belê Tevgera Jinên Kurd „daxwaza xwe ya naskirina nasnameya çandî“¹⁷ û rexneyên xwe yên li hemberî „Tirk, Tirkbûn û li

olduğu için, kadın için söylenmiş [...] bu söze o dilden söylendiği için karşı durabiliyor mesela, bu mesela bir temel sıkıntıdır.“

¹⁵ „ayrı bir ezilme pratiği“

¹⁶ „Öbür taraftan Kürt Kadın Hareketi'yle feminist hareket arasında önemli gerilim hatları var. Yani Türkiye'de feminist hareket üç aşağı beş yukarı [...] Kemalizm, Atatürkçülük veya modernleşme yaklaşımından türemiş, onun bir tür çocuğu ya da torunu diyebiliriz. Daha orta sınıf, [...] daha Türk, yani Atatürkçü, Kemalist, modernist bir perspektif var bazı kadın hakları örgütlerinde. [...] Kürt Kadın Hareketi'nin [...] Kürt kadınının ayrı bir ezilme pratiği yaşadığına dair çok ciddi eleştirileri var. Aslında bunlar da çok önemli ufuk açıcı şeyler oldular. Yani 90' larda 2000' lerde feministlerin önemli bir kısmı bu eleştirileri çok ciddiye aldı ve [...] Kürt Kadın Hareketi'yle feminist örgütler çok ortak [...] çalışmaya başladılar.“

¹⁷ „kültürel kimliğinin tanınması talebiyle“

hemberî polîtîkayên ‚asîmîlasyonê‘ yê nûjên ên Komara Dewleta Tirkiyê“¹⁸ bi hev re pêşkeş dike, ev jî dibe xeteke polîtîk a girîng (Sancar 2014: 34). Li gorî Sancar femînîst van rexneyan guhdar dikin û nîqaş dikin. Di heman demî de dest nişan dike ku wê berê femînîstan bi giranî wek „Jinên Tirk ên spî ji çîna navîn“ pênase kiriye, lê neha dibîne ku di nav tevgera femînîst de jinên Kurd jî hene, û êdî bi vî awayî nafikire (Sancar 2014: 34). Di çarçoveya nîrxandinên Sancar de dikare bê gotin ku Tevger(ên) Femînîst ên Tirkiyê ne tevgera homojen e, li gorî rexneyan xwe diguhere û avasazîyekê ku cudahiyan jî di nav xwe de bi cîh dike, ye.

Xaleke din a girîng ji bo nakokiyên jî ew e ku, Tevgera Femînîst hemû şîdetên çekî „wek şîdeta nêr“ (Sancar 2014: 34)¹⁹ pênase dike û ji ber ku Tevgera Jinên Kurd di çarçoveya polîtîkayên nasnameya etnîk de navber naxe nava xwe û şerê çekdarî tê rexne kirin. Sancar vê rewşê wekî xeta şikestinê dibîne: „di mijarên şîdetê, şîdeta biheq – şîdeta neheq, dîsa daxwazên derbarê hemwelatîya wekhev, di pîrsgirêka naskirina cudahiyan çandî [...] de xeta nakokîyê-nîqaşê ya siyasî heye.“ (Sancar 2014: 34)²⁰

Sedemên xeta vekêş û pevçûnê ku di dema koalîsyonan de ji ber sedema nasnameyên etnîkî derdikevin holê, ji hêla aktorên tevî lêkolînê bûn ve wek pêvajoyên pêşdarazî û cudakirinê yê beramberî hev tîne pêş xistin, tîne binav kirin (Arif û yê din 2015: 46). Selen Doğan, ji Uçan Süpürgeyê ya ji Enqerê van pêvajoyên ku di civînên koalîsyonan de derdikevin holê bi vî awayî bin xêz dike:

Di civîneke berfireh de ku tevgerên jinan tîne cem hev rexisteneke jin rêxistina din bi nijadperestiyê tawanbar dike, ya din jî wê ji bo ku mafên jinên Kurd diparêze bi PKK'yî bûnê tawanbar dike. (Doğan 2014: 38)²¹

Li gorî aktîvistên femînîst ên Platforma Piştgiriya bi Jinan a bajarê Denizliyê weki mînak: „Dema behsa pîrsgirêka Kurd, tevgera Kurd dibe, hin jin kelemê datînin ber tekoşîna jinan.“

¹⁸ „Türk, Türklük ve Türkiye Cumhuriyeti Devleti'nin modernleşmeci ‚asimilasyon‘ politikalarıyla“

¹⁹ „eril bir şiddet olarak“

²⁰ „Şiddet, haklı şiddet, haksız şiddet meselesi ve devlete karşı eşit vatandaşlık talepleriyle ilgili, kültürel farklarının tanınması meselesiyle ilgili bir siyasal [...] tartışma-çatışma hattı var.“

²¹ „[...] Kadın örgütlerinin bir araya geldiği geniş katılımlı bir toplantıda, bir kadın örgütü diğerini milliyetçilikle suçluyor, diğeri onu [...] Kürt kadınların haklarını savunduğu için PKK'lı olmakla suçluyor.“

(Anonim 2015: 90)²² Ji Komela Navenda Jinê *Yaşamê* ya bajarê Trabzonê Nurber Gürdal dibêje ligel pêşdarazî û cudakirinê ew her çiqas li ser pirsgerêka jin ben cem hev jî, beyî ku bîn ser mijara jin, mirov di nav hev de dibin grubên cuda cuda. Lê dîsa jî li gorî wê di demên dawî de ev rewş hatiye derbas kirin û li ser bingeha jin li hev kom dibin (Gürdal 2015: 32).

Mukaddes Alataş a ji Navenda Jinê ya Kardelenê ji bajarê Dîyarbekirê dibêje dema tekîlî berdewam bikin, pêşdarazî hildiweşin:

[...] em neha bi tevgera jinên Tirkiyê re pir ten cem hev. Berê bi awayekî cuda li me dinertin. „PKK’yî, terorîst“, [...]mînak em salê herî zêde du caran bi sazîyên jinan re tîn ba hev. Platforma me ya tekoşîna li hemberî tundiyê heye, platformên me yên hevpar hene. [...] destpêkê di platformê de weha dinertin. Em gelek dihatin hemberî hev, gelek pevçûnên cidî hatin kirin. Ango me wisa [wek] bêteşe, tu tişt nezan, [...] – medya dewlet, sîstem Kurdan çawa digire dest, bi wî awayî li me dinertin [...]. Ev nêzikatî hinek hat şikandin. [...] Ango [...] [her çiqas] li Herema Egeyê [...] û Deryaya Reş hin berdewam be [jî], lê belê alîyên navîn [Herema Anatolîya Navîn, deverên ku ne li kevîyê avê ne.] zêdetir (...) pêwîstîya Tevgera Jinên Kurd dibînin. Wan jî di pratîkê de dît ku ku vê hêza rêxistinî pir tiştan ava dike. (Alataş 2015: 38)²³

Di daxuyanîya Alataş de dîyar dibe ku Tevgera Jinên Kurd li heremên cuda yên Tirkiyê de cuda tê dest girtin; li aliyekî potansiyela wê ya ji bo xebateke hevbeş tê dîtin, li aliyê din de jî ji ber sedama helwesta wê ya ser mijara etnîkî hezekî ku jê dûr tê sekinandin e. Her çiqas li gorî hevpeyvînên pisporan etnîsîte wek faktorekê ku tevgerên jinan ên Tirkiyê ji hev dûr dixîne derkeve holê jî, li gorî, Alataş di encama tekoşîna rexistinî ku Tevgera Jinên Kurd di pirsgerêka jinê de dimeşîne vê rewşê diguherine. Bi demê re bi naskirina hev, tekîlîyên bi hev re pêşdaraziyên li hemberî jinên Kurd ku bi riya medyayê hatibûn belav kirin, tîn şikandin û di çarçoveya polîtîkayên jinê de pirsgerêkên hevbeş derdikevin pêş. Mirov dikare bibêje ku

²² „Kürt sorunundan Kürt hareketinden bahsedildiği zaman bazı kadınlar kadın mücadelesini sekteye uğrattıyor.“

²³ „Türkiyeli kadın hareketleri ile çok sık bir araya geliyoruz, daha önce bize [...] PKK, terörist [diye; A.P.] bakıyorlardı. [...] mesela biz en fazla yılda iki defa kadın kurumlarıyla bir araya geliriz. Şiddetle mücadelede platformumuz vardır, ortak platformumuz vardır. [...] önce öyle baktılar, platformda. Çok çatıştık, çok ciddi çatışmalar yürütüldü. Yani bizi [...] hani çok kaba, [...] hiçbir şey bilmeyen, [...] medya, devlet, sistem, Kürtleri nasıl tanıttıysa, öyle algılıyorlardı. [...] Bu algı kısmen yıkıldı. Yani [...] Ege [...] ve Karadeniz’de biraz daha devam ediyorsa [da; A. P.] fakat iç taraflar [İç Anadolu Bölgesi gibi kıyı bölgesi olmayan bölgeler kastediliyor; A.P.] daha çok [...] Kürt Kadın Hareketi’ne ihtiyaç duymaya başladılar. Bua örgütlü gücün çok şey yarattığını pratikte gördüler.“

nirxandinên rexnegirî û civakî ya Tevgera Jinên Kurd ên di derbarê wekheviya jinan a li Tirkiyê de tê dîtin û baldar girtin.

Ol/bawerî/muhafezekarî

Li gorî kod kirina dîtinên pisporan ku di çarçoveya hevpeyvînan de derketin hole, tê dîtin ku di mijarên ol, îslam û nirxên muhafezekar de tevgerên jinan seknên cuda nişan didin. Dema di çarçoveya ol / muhafezekarî de mijara „îslamîzmê“ „duserîbûna [...] giştî ya li Tirkiyê“ digre dest, di tevgera jinan de jî „wek yek ji qadên nîqaşê ya civakê ku li ber diyalogê [...] kelem datîne[...]“²⁴ tê dîtin (Atasü Topçuoğlu 2014: 27).

Dîtina ku, tevgera jinan a oldar û muhafezekar di têkîliyên xwe yên bi partiya desthilatdar AKP re „xwe jê qutkirin û berçavderbaskirina pozîsyona xwe de her ku diçe dikeve zoriyê“²⁵ di vê raporê de di beşa dîyarkirina pirrengîya tevgerên jinan ên Tirkiyê de hatibû dest girtin (Acar 2014: 26). Di vê çarçoveyê de Sevinç Hocaogulları ku li ser navê Malên Gel, *Halkevleri* ji Enqerê tevî hevpeyvînen me bû, dest nişan dike ku ew wek Malên Gel pir naxwazin bi „rêxistinên jinên îslamîst“ re di platforman de werin cem hev, „lê disa jî ji bo ku nekevin pozîsyoneke cudakir heta ku derfet hebe hewl didin ku li ser esasa jintiyê“²⁶ bi wan re bimeşin (Hocaogulları 2014: 18). Hocaogulları tîne ziman ku; ev rêxistin pozîsyona ku „jinan dike rêza duyem“²⁷ diparêzin û li hemberî „desthilatdariya AKP, ku weki partiya hikumetê ji zêdebûna şîdeta li ser jinê berpîrsîyar e“²⁸ dernakevin, an jî „di rastiyê de parastina pozîsyona jinê ya duyemîn“²⁹ diparêzin (Hocaogulları 2014: 18). Di vê çarçoveyê de Nurcan Ay Katırcı, ji Platforma Jinan a bajarê Artvînê, tîne ziman ku dîsa di pêvajoya damezirandina platformê de ji jinên alîgirên AKP û Eğitim Bir-Sen'ê ku bi seknên xwe yên muhafezekar tîne naskirin ji hev dûr ketine (Ay Katırcı 2015: 36). Mirov dikare bibêje ev daxuyanî û minakên tîne dayîn di bin sernivîsa ol û muhafezekarî de ligel seknên muhafezekar ku pozîsyona jinê ya duyemîn diparêzin, li ser tekîlîyen bi AKP re jî tê sekinandin.

²⁴ „diyalogun [...] sekteye uğradığı [...] temel toplumsal tartışma alanları“

²⁵ „kendini ondan ayırarak konumunu sürekli sorgulaması[nın] giderek zorlaştığı“

²⁶ „mümkün olduğunca ortak kadın düzlemlerinde, bölen pozisyonda olmamayı dengeleyerek sürdürmeye“

²⁷ „kadınları ikincilleştiren“

²⁸ „AKP iktidarına yani kadına yönelik şiddetin bu kadar artmasına neden olan bir iktidara“

²⁹ „kadınların aslında ikincil konumunu savunan“

Li gorî dîtina Ferîde Acara ji Zanîngeha Teknîk a Rojhilata Navîn ji hêla oldarî/muhafezekarî de bi taybetî di mijarên kurtaj, li ser hebûna jinê – wek endama malbatê û kesayet – de li Tirkiyê di navbera tevgerên jinan de xalên ji hev cudabûnê hene (Acar 2014: 26). Ji Yekitîya Jinên Tirkiyê Sema Kendirici Uğurman di çarçoveya ol / muhafezekarî de nîqaşa ku di çalakîyeke hevpar de li ser azadîya bedenî û zayendî ya jinan derketiye holê weha vedibêje:

[...] em dimeşin, di vê navberê de destê me de [...] pankartên me hene. Li wir [...] me nivisandîye „hun nikarin dest bidin beden û zayenda me!“ [...] Kesên [dibêjin] oldar [in] [...] – an jî ew ji xwe re wisa dibêjin – [...] hin kes hatin gotin „em vê afîşê naxwazin!“ Çima? Gotin „Em nikarin di bin vê de bimeşin“[...]. (Kendirici Uğurman 2014: 23)³⁰

Nêrîna, di tekoşîna wekheviya zayenda civakî de aktîvistên ku motîvasyonên xwe ji nîrxên olî digirin, di derbarê mijarên azadiya cinsî an jî mafê bixwe-biryardayîne yê ser bedena jinê de xwedî helwesteke dûr in, ji alîyê profesora ku li Zanîngeha Teknîk a Deryaya Reş a bajarê Trabzonê dixêbite ve jî tê ziman. Li gorî Şahînde Yavuz di çarçoveya nîrxên olî/muhafezekar de hin jin û rexistinên jinan nikarin piştgiriya hemû sloganên derbarê azadiya bedena jinan bikin û weki mînak kampanyaya kurtajê „Bedena min! Biryara min!“³¹ nîşan dide.

[...] Mînak hin jin di kampanyaya „Bedena min! Biryara min!“ de nikarin zikê xwe tazî bikin, ez hêvî nakim. Hin kes ji ber ku li hemberî kurtajê ne û ji muhafezekariya xwe slogana „Bedena min! Biryara min!“ destek nakin. Tevgera jin di hin biryarên ku sînorên muhafezekariyê zor dike de ji hev cuda dibin.(Yavuz 2015: 15)³²

Ji Uçan Süpürgeyê Selen Doğan netevlîbûna çalakiyê ya hin aktorên aktîf ên tevgera jinên oldar/muhafezekar – bi hinceta ku „kincên vekirî li xwe kiribû“ tevî çalakiya jina hatibû

³⁰ „[...] Yürüyoruz, bu arada elimizde [...] pankartlarımız var. Orada [...] ,Bedenimize, cinselliğimize dokunamazsınız!‘ diye yazmışız. [...] Dindar dedikleri [...] – ya da kendilerine öyle diyorlar – [...] bir kesim geldi dedi ki ,Biz bu afişi istemiyoruz!‘. Neden? ,Bunun altında yürümeyiz biz‘ dediler. [...]“

³¹ Di çarçovaya vê kampanyayê de jin wênayên zikên xwe yên ku li ser „bedena min biryara min“ nivîsandîbûn – tazî kişandin û online weşandin. Di sala 2012’an de bi sedhezaran jin li hemû deverên welêt li hemberî zagona kurtajê, ku ji alîyê AKP ve hatibû plan kirin, derkêtin kolanan û bi vî awayî plansaziya zagonê dan sekinandin.

³² „[...] Bazı kadınlar mesela kürtajda ,Benim bedenim! Benim kararım‘ diye göbeğini açamaz, beklemem ben. Bazıları ,Benim Bedenim! Benim Kararım!‘ adlı sloganı, kürtaja karşı olmak ve muhafazakârlığından desteklemeyebiliyor. [...] Bu tip muhafazakâr sınırları zorlayan bir takım kararlarda ayrılabilirler kadın hareketi.“

tecawizkirin nebûn – bi xeta wan a bavixsalariyê (bi gotina „te jî bi vî awayî li xwe nekira“ balê dikişinin ser lixwekirina gorî civakê) ve şîrove dike (Doğan 2014: 38). Ev mînak nîşan didin ku, ji bo hin koman nirxên oldarî an jî muhafezekarî li pêşiya azadbûna beden û zayenda jinê wek astengî tînin nirxandin. Mirov dikare bibêje ev rewş di çalakiyên qada giştî de an jî di mijarên civakî û siyasî de hevkarî û xebatên hevbeş ên tevgerên jinan li Tirkiyê dike tengasiyê.

Di çarçoveya ol/muhafezekarî de mijara sergirtinê ji alîyê gelek beşdarvanan ve wek xaleke cihêkir a tevgerên jinan derdikeve pêş (mînak: Anonîm 2014: 21; Üstün 2014: 32; Can 2015: 13). Di xala „mijara sergirtinê/olê“ de li gorî dîtina Serpîl Sancara ji Zanîngeha Enqerê pîrsa „sergirtin pîrsgirêkeke azadîyê ye, an jî ji bo ol e?“³³ gelek girîng e (Sancar 2014: 34). Ji Koalîsyona jinan a Enqerê Ilknur Üstün dema mijara sergirtinê mînak dide, gengeşiya bi serbestbûna sergirtinê ya li dibistanên seretayî û lîseyan derketiye, ev yek bandorekî çawa li ser tevgerên jinan kiriye û helwestên cuda çawa derketine, wek li jêr şîrove dike:

[...] Bi rêzîknâmê meseleya sergirtinê anîn dibistanan, herkes mîna kevanekê ragêşiya. [Ji ber ku] îcraata hikumetê [bû] û mijara azadiyan de vegeyriya xwendina niyetê. Ji nava hin tevgeran hin komên jin di vî mijarê de gelek tûj, gelek misoger û zelal karîbun bibêjin „gelek baş bû“. Ji alîyê din jî tiştêkî ku dibêje [dê ev tişt] muhafezekariyê, tirsên derbarê pêşerojê de, fikaran [...] – bi awayekî mafdar – zede bike. (Üstün 2014: 32)³⁴

Ji alîyê hikumetekî muhafezekar û oldar ve rakirina qedexeya sergirtinê, ji hêla jinên ku xwe olperest pênase nakin ve gavekê ji bo azadîyê zêdetir, wek polîtîkaya hikumetê ya oldar, fermî û nêrza, ku li gorî esasa kevneşopî û rêbazan hatiye lidar xistin tînin nirxandin.

Sema Kendirici Uğurman – peymanên navnetewî ku kesên temenê wan ji 18'ê piçûktir in, zarok tînin hesabandin bibîr tîne – li ser vî esasî jî sergirtina zarokên diçin dibistana seretayî wek azadîyê nanirxîne. Ligel vî mînaka koalîsyona hevpar a tevgerên jinan a ji bo serbestberdana sergirtinê li zanîngehan jî wek gavekî ji bo azadîyê dinirxîne (Kendirici

³³ „örtünmek bir özgürlük problemi midir, yoksa bir inanç gereği midir“

³⁴ „[...] Okullarda başörtüsü meselesi getirildi yönetmelikte, herkes yay gibi gerildi. Hükümetin icraatı olması meselesi ile özgürlükler meselesi arasında niyet okumalara dönüşen bir şey var. Bazı hareketin içinden bazı kadın grupları bu konuda son derece keskin, kesin, ‚net son derece iyi oldu‘ diyebilirken öte yandan bunun giderek muhafazakârlaşmanın ve gelecekle ilgili de korkuları, kaygıları [...] – haklı biçimde arttıracağını iddia eden – bir şey var.“

Uğurman 2014: 23). Li gorî Kendirici Uğurman, aktîvîstekê ku bi salan e li hemberî zewaca di temenê zaroktîye de tekoşîn dimeşîne; muhafizekarî li Tirkiyê bi mijarên zarokên keçik û jinan re tekîldar tê ava kirin (Kendirici Uğurman 2014: 23). Mînakeke din a balkêş ku Kendirici Uğurman di xala ol û muhafizekarî de dide jî nexwestekiya hevkarîyê ya jinên oldar bi LGBTI'yan re ye û li gorî Kendirici Uğurman vê biryara xwe jî bi olê ve girê didin (Kendirici Uğurman 2014: 23). Dîsa li gorî Kendirici Uğurman ger ev komên ku binav dike „mijara jintiyê [...] helwesta xwe ya azadîyê ne li ser esasa ol, li ser esasa mirovatîyê, esasa gerdûnî bigirtina dest, dikaribûn bi LGBTI'yan re li cem hev bisekinin.“ (Kendirici Uğurman 2014: 23)³⁵

Mijareke din ku di bin sernivîsa ol/ muhafizekarî de tê nirxandin, pêşdarazên li hemberî jinên sergirtî ne. Li gorî aktîvîstên Platforma Piştgiriya bi Jinan a bajarê Denizliyê jinên sergirtî di bin gotinên laîk de tahde dîtî, ji bo azadiya sergirtinê tekoşîn dan û bi xwe serketin (Anonim 2015: 101). Aktîvîstên femînîst ku li ser navê platformê hevpevîn çêkirin; kesên ku bi dîtînin xwe yê di salên 1990'an de di çarçoveya muhafizekarî û tekoşîna jinan de di sêkoşeya jin, femînîst û îslam de nîqaşan pêş xistin, nivîskara femînîst a misilman Konca Kuriş û Sîbel Eraslan, ku di dema Partîya Refahê de di mijara jinê de dihat naskirin, wek mînak nişan didin (Anonim 2015: 101). Aktîvîstên platformê rexneyên jinên oldar ên li hemberî Tevgera Femînîst, „îdîaya [...] tevgera burjuva“, heta dereke di cîh de dibînin, û tînin ziman ku têkîliyên navbera Tevgera Femînîst û yê jinên oldar bi tengav e. (Anonim 2015: 101).

Li gorî Nesrin Semiz, aktîvîsta Platforma Jinan a Paytextê ku mirov dikare vê platformê wek platformeke oldar/muhafizekar binasîne, tevgera jinê „bi taybetî hesasiyeta olî an jî ramana olî, ango wek kesekê oldar jîyan kirinê wek astenga herî mezin a li hemberî jinê dibîne.“ (Semiz 2014: 23- 24)³⁶ Li gorî Semiz jinên femînîst bi perspektîfên wek „sergirtin bi zextên zilaman pêk tê“³⁷ û „mîrov nikare him serê xwe bigire, him jî femînîst be, an jî di nav tevgera jinan de cihê xwe bigire“³⁸ nêzikî jinên sergirtî dibûn, lê dû re vê tehdê û serdestiyê ferq kirin (Semiz 2014: 24).

³⁵ „kadînlîk meselesini, [...] özgürlük anlayışlarını din temelli değil de insan temelli, evrensel temelli bakabilselerdi LGBT'lerle de yan yana durabileceklerdi.“

³⁶ „özellikle dini hassasiyeti veya dini düşünceyi, yani dini dindar olarak yaşamayı, kadının önündeki en büyük engel olarak gören bir anlayışa sahip“

³⁷ „başörtüsünün erkekler tarafından dayatıldığını“

³⁸ „hem başını örtüp hem de feminist olabilme şansın yok veya kadın hareketinin içinde bulunabilme şansın yok“

Tengezariya di navbera ol û laîkîtiyê li hemû deverên welêt tê hest kirin, ev yek dibe sedema jihev cudabûn û parçebûna tevgerên jinan, ji aliyê din de jî dibe sedema xitimandina têkiliyan an jî li pêşîya destpêkirina diyalogan dibe bertek. Pirsgirêka sergirtinê hîn jî ji bo hin alîgirên wek bingeha vê nîqaşê tê dest girtin. Li ser vê esasê jî pênasînên beramberîhev ên jinên îslamîst û jinên laîk di tekoşîna jinan a welêt de xeta nîqaşê diyar dike.

Di çarçoveya perspektîfa karaktera dijber a tevgerên jinan de, di nav mijarên ku di bin sernivîsa ol/muhafezekarî de hatine kod kirin de rexneya herî mezin li tevgera jinên oldar/muhafezekar tê kirin. Tevgera Jinan a Oldar li hember polîtîkayên Partîya hikumetê AKP ku nêzikatiyên xwe yê muhafezekar di pêvajoya desthilatdariya xwe de ji nû ve ava kiriye, bêdeng maye. Ev nirxandin li ser gotinên „yên din“, ên ku di derbarê tevgera oldar/muhafezekar de anîne ziman, hatin kom kirin. „Yên din“, ango aktorên ku xwe di nava tevgera jinên oldar/muhafezekar de nabînin, vê tevgerê têrî xwe wek tevgera protest nabînin. Lewre li gorî wan nêzikatiya Tevgera Jinên Oldar di mijarên ol û jinê de wek a partiya hikumetê ye. Ev yek ji aliyê aktîvistên oldar ku di nava tevgera jinan de wek aktivîst cîhê xwe digirin, wekî cudakirîya tevgerên femînîst tê nirxandin. Lewre hin tevgerên femînîst li ser aliyê erênî ya olê, ku nasnameyekê dide mirovan napejirînin û herweha sergirtinê (wek awayekî derbirîna oldarîyê) wek biryarekê kesayetî napejirînin, (naxwazin bipejirînin). Di daneyên hevpevînên pisporan de gotinên xweser ên tevgerên jinên oldar/muhafezekar gelek kêmtir in. Ji bo vê yekê zehmetiyên bi wan re ketina têkiliyê û kêmtir tevlihbûna wan a hevpevînan dikarin wek sedemên bîhêz dan.

Zayend (-a civakî) / Zayendî / Nasnameya Zayendî

Di analîzkirina hevpevînên pisporan de Zayend (-a civakî) / zayendî / nasnameya zayendî di navbera tevgerên jinên Tirkiyê de wek xalekê cihêbûnê derket holê. Ji yek taybetiyeke balkêş a kodkirina vê mijarê di hin meseleyan de têkildariya wê ya bi mijara ol/muhafezekariyê ye.

Dilek Bulut ji Komeleya Jinan a Karyayê, ku li Muğlayê xebatên xwe dimeşîne, hin xalên ku femînîzma radîkal di warê zayend /zayendî de diparêze, çawa bandorekî neyînî li ser hevkarîya aktorên cuda dike, bi mînakên nîşan dide. Li gorî Bulut:

Femînîzma radikal [...] li ser zayendîtiyê pir bi hêsanî diaxife, zayendîtiya xwe pir hêsan diaxife, nêzikatî û helwesta wê ya derbarê zayendîtiya azad û vê anîna ziman [...]di têkilî avakirina bi femînîstên ku xwe bi xof [...] pênase dikin re, hinek dibe asteng.(Bulut 2015: 24).

Bulut dest nîşan dike ku „girêdayî şîdetê, [ji bo jinên] ku di ferqa şîdeta psikolojik a li nav malê de ne, şîdeta li kolanan dibînin, kuştina jinan dibînin û bi hemî weslên xwe di nav mijara jinê de ne ,pirsgirêkên ku di pratîkê de jiyana dikin“³⁹ ji bo wan hin girîngtir in, lewre jî daxwazên bi vî rengî ku wek ên femînîzma radikal tê zanîn, ji wan re zêde tê (Bulut 2015: 27).

Li ser şopa nirxandinên Bulut, tevgerên jinan zayendîtî, azadîya zayendî di kîjan çarçoveyê de digirin dest û diaxifin, di vê mijarê de dîtînen cuda di tevgera LGBTI de jî derdikeve holê. Li gorî Firat Varatyan, aktîvistê LGBTI ji Masîyê Binevşîn *Mor Balık* li bajarê Trabzonê, şoreşa zayendî têgîneke ku azadîya nasnameya zayendîtiyê digre nav xwe, ligel vê seks pedivîyeke fîzyolojik e, lewre jî pirsgera li vir daxistina şoreşa zayendî asta seksê ye, ango daxistina „tişteki ku di nav cih [...] de xwe valekirinê“⁴⁰ ye. Her weha li gorî Varatyan „tevgerên jinan vê yekê hin mehremtir digirin [dest].“ (Varatyan 2015: 26)⁴¹

Di çalakîyên koalîsyonan de sloganên derbarên zayendîtî, mijarên zayendî û hevzayendîtî bi awayekî paralelê gotinên Bulut yek ji mijarên nîqaşê ye. Li gorî gotinên Gülsen Ülker ji Weqfa Piştgiriya Jinan a Enqerê berê hin sloganên tevgera LGBTI di derbarê azadîya hevzayendîtîyê, bihevrebûna hevzayendan û sloganên femînîstan ên di derbarê azadîya zayendî de rastî nerazîbuna gelek jinên ku di nav rexistinên çepgirt de cîh digirtin dihat, heta hin aktor xwe ji çalakîyên hevbeş paş de dikişandin (Ülker 2014: 30). Derbarê mijara sloganan de mînak ku ji aliyê Sema Kendirici Uğurman ve di bin sernivîsa ol/muhafezekarî de hatibû ziman, ku tevgera jinên oldar/muhafezekar nexwestine di bin pankarta „hûn nikarin dest bidin zayendîtiya me!“⁴² bimeşin, dîsa wek mînak dikare were dayîn (Kendirici Uğurman 2014: 23). Li gorî Dilek Bulut ev yek li herema Muglayê jî xalekê cudabunê ye. Di çalakîyên 8'ê Adarê an jî 25'ê Mijdarê de ku bi awayekî hevbeş ji aliyên komên cuda ve tên organîze kirin, wek mînak

³⁹ „Şiddet bağlamında, evde gördüğü psikolojik şiddetin farkında olan, sokaktaki şiddeti gören, kadın cinayetlerini gören ve kadın meselesine gövdesi ile giren kadınların ,pratiklerinde yaşadıkları sorun daha can alıcı.“

⁴⁰ „yatakta [...] boşalma duygusuyla gerçekleştirdiğin bir şey“

⁴¹ „kadın hareketleri bunu daha mahrem tutuyor“

⁴² „Cinselliğimize dokunamazsınız!“

„sloganên ku femînîstên Vegan an jî radîkal di derbarê zayend û zayendîtîyê de diavêjin“⁴³ ji bo hin gruban dibe sedema merak û fikaran, hin jî „dixwazin van sloganan bibîzin.“ (Bulut 2015: 31)⁴⁴

Ligel mijara zayendîtîyê, mijareke girîng ku di bin vê sernivîsê de tê analiz kirin jî nêzikatîya li hemberî LGBTI û hevzayendîtîyê ye. Taybetî jî aktîvîstên LGBTI hin nêzikatîyên homofobîk/transfobîk ên tevgerên jinan li Tirkiyê di hevpeyvînên xwe de weki xalên cudabûnê/cudakirinê dinirxînin (mînak: Arif û yên din 2015: 24- 28; Çiçek & Gülen 2015: 6; Kandok 2015: 38; Zeze 2015: 34). Hin aktîvîstên tevgerên jinan tengazarîyên ku di salên 1990’an û destpêka 2000’an de di civîn û platformên hevbeş a tevgerên jinan de ji ber sedema aktîvîstên LGBTI derketine hole tînin ziman. Ji Zanîngeha Hacettepê Reyhan Atasü Topçuoğlu li gorî çavdêriyên xwe di destpêka salên 2000’an de li Enqerê bertekên homofobîk ên li hember lezbîyenên aktîvîst ên ku li ser navê KAOS GL tevî civînên hevbeş dibûn, dike (Atasü Topçuoğlu 2014: 27). Li gorî Atasü Topçuoğlu diyaloga navbera LGBTI û tevgerên jinan di encama pevajokeyê ku ji destpêka 2000’an heta îro hatiye meşandin de, pêk hatiye (Atasü Topçuoğlu 2014: 27). Li gorî Ayşe Balkanay a ji Denizliyê, – ji Komeleya Piştgiriyê ya bi Jinên Karsaz – , mijarên derbarê LGBTI de wek tabuyê ne, sedema vê yekê jî dema kes derbarê LGBTI de „diaxivin, difikirin ku divê yê bên pirsyar kirin ew in.“ (Balkanay 2015: 42)⁴⁵ Ji femînîstên Vegan a Muğlayê Zeze dibêje, ji ber ku tevgerên jin di bin bandora bavixsaliyê de ne, lewre jî li ser kesên bi nasnameyên zayendî yên cuda serdestiyê dikin û ji bo ku ev serdestî bê şikandin û zayendperestî û homofobî bê pirsyar kirin, divê tevgera LGBTI bikeve nav tora têkiliyên tevgerê:

[...] Ji xwe ez di nava van tevgeran de gelek nû me. Tiştê ku ez dibinim ev e: Erê bi awayekî puxteyî em hemû jin in û [...] ji bavixsaliyê bi heman awayî bi bandor dibin. Lê [...] dema em jintiya xwe bilind dikin [...] mirovên ku xwedî nasnameyên zayendiyên cuda ne ji cih de ji bîr dikin [...]. Ev yek ji min re pir homofobîk tê, transfobîk tê. Wek mînak [...] di çalakiyê de ji nişkev de [...] di derbarê transan de [...] sloganekê dij dikare biavêje û [...] dibêje. Li wir [...] dimînî, ango, ez li ku me, [...] çi bû. Dema weha dibe pir xerab dibe, [...] li

⁴³ „vegan feministlerin ya da radikal feministlerin cinsiyetle ilgili, cinsellikleri ile ilgili atacakları sloganlar“

⁴⁴ „sloganları duymak istiyorlar“

⁴⁵ „konuştuğu zaman, sorgulaması gerekenin belki kendi olduğu düşünüyor.“

gorî min divê hinek xwendinên queer bên kirin, rexne, an jî atölye [...] li vir, lewre ew ziman pir pêwîst e. Ango LGBTI li Tirkiyê an jî li cihanê [...] rêxistinekê ku emê pê re piştgiriya bikin e [...] em wek femînîst bêyî wê nikarin tişteki bikin [...]. Lewre jî [...] di nav van tevgeran de zimanê zayendperest, homofobîk [...] nêza pirsyar nakin, [...] çavbirçîtiya serdestiyê, [...] çavbirçîtiya nav [...] me, pirsyar nakin. [...] Em derkevin kolanan, ew tişteki pir baş e, lê di hundir de vê torê avakirin jî pir pêwîst e. (Zeze 2015: 28)⁴⁶

Zeze balê dikişîne ser nehevkarîya tevgerên jinan a derbarê LGBTI de û dibêje di çalakiyan de nepejirandina sloganên mijarên LGBTI digirin dest, divê bê pirsyar kirin (Zeze 2015: 34). Ji însiyatîfa LGBTI'ya Denizliyê û Malbatên wan Halil Kandok Zezeyê piştrast dike, li gorî wî her çiqas tevgerên jinan ji derve de azadîxwaz û wekhevîparêz xuya bikin jî „di rastiya xwe de heteroseksîzma di nav xwe de pirsyar nakin.“ (Kandok 2015: 38)⁴⁷ Kandok di nêzikatiyên azadîxwaz de balê dikişîne ser „teslîmîyeta hember heteroseksîzmê.“ (Kandok 2015: 38)⁴⁸ Ji Diyarbekirê aktîvîstên ji însiyatîfa LGBTI KESKESOR'ê jî pêşdaraziyên ku jiyan kirine, tînin ziman. Li gorî çavdêriyên wan, li herema Diyarbekirê hin rêxistinên jinan dibêjin qey yekane pirsya rêxistinên LGBTI „bi hêsanî zayendîtiya xwe jiyan kirin“ e (Çiçek û Gülen 2015: 6). Nêzikatiyên bi vî rengî bandor li ser wan dike, li gorî Çiçek û Gülen sedema van nêzikatiyan di saziyan de hebûna bandorên homofobî û transfobi ye (Çiçek û Gülen 2015: 6).

Xalên din ên di bin sernivîsa zayendî/zayendîtî de hatine kod kirin û wek nêzikatiyên heteronormatîf, transfobîk û homofobîk tînin dest girtin û dibin sedema cudabûnê jî nasnameyên trans û karkeriya seksê ye. Di hevpeyvîna li Diyarbekirê bi Însiyatîfa LGBTI

⁴⁶ „[...] Ben çok yeniğim zaten bu hareketlerin içinde. Benim gördüğüm şey şu: Evet özcü olarak hepimiz kadınız ve [...] kadın olarak tabii ki aynı etkileniyoruz ataerkillikten. Ama [...] başka cinsel kimlikte olan insanları hemen unutuyoruz [...] kadınlığımızı yükseltirken. [...] Bana çok homofobik geliyor, transfobik de geliyor. Mesela [...] eylemde birden birisi [...] dönmelerle ilgili [...] anti bir slogan atabiliyor ve [...] söyleyebiliyor. Orada [...] kalıyorsun yani, neredeyim ben [...] ne oldu falan. İşte o olunca çok kötü oluyor, [...] bence biraz kuir feminist okumalar yapılması gerekiyor, eleştiriler, ya da atölyeler [...] burada çünkü o dil çok önemli. Yani bizim Türkiye'de ya da dünyada [...] dayanışacağımız örgütlerden birisi LGBT örgütü. [...] Ondan ayrı bir şey yapamayız feministler olarak [...]. O yüzden [...] bir dilin çok [...] cinsiyetçi ve homofobik olmasının [nı], [...] erilliğimizi de sorgulamıyoruz bu hareketlerin içinde. Yani o hiyerarşiyi sorgulamıyoruz, [...] iktidar hırsını, [...] kendimizdeki o [...] hırsı, sorgulamıyoruz. [...] işte sokağa çıkalım; o çok güzel bir şey ama biraz da içeride de bu ağı doğru öğretilmek de çok önemli.“

⁴⁷ „aslında heteroseksizmi onlar da içselleştirmişler.“

⁴⁸ „heteroseksist yapıya teslimiyetçilik“

Hebûnê re hate kirin de aktivist nîqaşên tevlîbûna çalakiya 8'ê Adarê ya li Diyarbekirê wek mînak nişan didin. Öykü civîna derbarê di korteja jinan de bihev re meşandina jinên trans wek „pir êş da“ bilêv dike (Arif û yê din 2015: 24- 28). Öykü tecrubeya xwe ya wek jineke trans bi vî awayî şîrove dike:

Bifikire, tu jinekê yî û te tenê bi [...] wesla [te ya cinsî] dinirxînin. [...] ev pir êş da û ew roj ez tevlî [...] meşê bûm, lê ew civîn ez pir êşandim bi rastî. Ango me li vir [...] bi hebûna xwe derfetê da ku ew [bi vê nêzikatiya xwe re] rûbirû werin, anga rêxistinên jinan hin jî [...] karkeriya seksê napejirînin, heta di bingeha xwe de me jî napejirînin. Lê ji ber ku di nav tevgera femînîst de ne, gorî min, wekî ku pejirandibin xuya dikin. (Arif û yê din 2015: 24- 28)⁴⁹

Öykü bi vê daxuyaniya xwe balê dikişîne ser têgihiştinên zayenda biyolojîk û civakî û ji ber ku xwe wek jinekê pênase dike û xwe aîdê vê zayendê dibîne, naxwaze li gorî taybetiyên ji der ên zayenda biyolojîk bê nirxandin. Ew dixwaze jinên trans wek hevkarên koalîsyonê ji hêla tevgerên jin ve bîn dîtin. Öykü bi vê daxuyaniya xwe di heman demê de di pênasekirina nasnameyên kesan de esas girtina zayenda biyolojîk pirsyar dike.

Li gorî Öykü ligel nasnameyên trans, karkeriya seksê jî di çalakiyên koalîsyonan de wek mijara nîqaşê derdikeve holê. Daxuyaniyên wê yê ve derbarê de ji hêla aktîvistên din ên LGBTI ve jî tîndest destek kirin. Li gorî Dilan Çiçek û Ceylan Gülen, ji Inîsîyatîfa LGBTI KESKESOR'ê, di navbera tevgera jinan û femînîstan de têgeha karkeriya seksê û bikaranîna têgehê gelek hewceyê niqaşê ye:

Di panelan de, wekî din, ev yek tim pir bi awayekî xurt tê nîqaş kirin. [...] Divê em vê karkeriya seksê li ku bi cîh bikin? Divê em bêjin koletiya seksê? Em bêjin fihuş? Karkeriya seksê ya bi darê zorê çi ye? Çima qêyên ku bi daxwaz dikin jî hene? Felan bêvan, ev tim tîndest nîqaş kirin. (Çiçek û Gülen 2015: 56)⁵⁰

⁴⁹ „Düşünsene sen bir kadının ve sırf seni [...] organına göre [...] değerlendiriyorlar. [...] bu çok acı vericiydi ve ben o yürüyüşü [...] yaptım ama o toplantı beni çok acıtmıştı açıkçası. Yani biz burada [...] varlığımızla aslında biraz yüzleşmelerini sağladık, yoksa kadın örgütleri hala [...] seks işçilerini bile kabul etmiyorlar, hatta bizi bile kabul etmiyorlar özlerinde. Ama feminist hareketin içinde oldukları için kabul etmiş gibi görünüyorlar bence.“

⁵⁰ „Panellerde falan da bu böyle çok hararetli bir şekilde tartışılır sürekli. [...] Bu seks işçiliğini nereye koymalıyız? Seks köleliği mi demeliyiz? Fuhuş mu demeliyiz? Zorunlu seks işçiliği nedir? Niye gönüllüsü mü var bunun? Falan filan, bunlar sürekli tartışılan şeyler.“

Di vê daxuyaniyê de xala ku tê net kirin ev e; li Tirkiyê di navbera tevgerên jinan de di mijarên „rewşên jinan ên derî kevneşopiyê“ de têgeh û kategoriyên nû hin jî bi fikar û bi şik tînin dest girtin, xalên şikestinê yê nav civakê di nava tevgerên jinan de jî cihê xwe dibinin. Li gorî Çiçek û Gülen li hereman jî di vê mijarê de jin ji hev cuda dibin (Çiçek û Gülen 2015: 56). Li gorî Arîf, ji *Hebûna* Diyarbekirê jî di vê xalê de di nav tevgerên jin û femînîzmê de qalibên cidî hene û dû re pirsê li heremê an jî li Tirkiyê „çend tevgerên jin [...] li ser pirsgerêkên jinên di malen seksê de dimînin diaxifin, an jî guhdar dikin, an jî dertên pêşberî wan?“⁵¹ dike. (Arif û yê din 2015: 29- 34) Li gorî Arif û Öykü di nav tevgerên jinan de ji bo hin derdor pêyva „karkeriya seksê“ wek tabu ye û vê pêyvê bi kar naynin. Ligel vê pêyva „fihuş“ê tê bikar anîn (Arif û yê din 2015: 29- 34). Li gorî Çiçek û Gülen sedema hember derketina karkeriya seksê û nebikaranîna wê, ol û ya din jî exlaq e; û herweha pêşdaraziya „qêy jin mal e, tê bazar kirin“⁵² heye (Çiçek û Gülen 2015: 83).

Taybetî li Diyarbekirê di derbarê karkeriya seksê de xalên cudabûnê ligel aktîvîstên LGBTI ji Komeleya Jinan Selîsê Zîn jî bi gotina xwe ya „pirsgirêkên me yêni kişandina [jinan a nav] fihûşê hene“⁵³ dide xuya kirin (Zîn 2015: 52). Ev berhevanî ji bo seknên cuda yêni derbarê karkeriya seksê de dikare wek delil bê nîşandan. Aktîvîstên LGBTI pêyva „karkeriya seksê“ bi kar tînin, lê wekî ku di gotinên Zînê de jî derdikeve holê karkeriya seksê bi awayekî exlaqî bi pêyva „fihuş“ê jî tê bikar anîn û ev yek tê problematîze kirin.

Di çarçoveya sernivîsa zayendî/zayendîtî de xalên cudabûnê yêni di navbera tevgerên jinan ên Tirkiyê de gelek cihereng in. Wekî ku di hevpeyvînên pisporan de jî derket holê, mijarên wek zayendîtîya jinê, azadiya zayendîtî ya jinê, hevzayendîtî, mijara trans, karkeriya seksê, nixirên heteronormatîf, transfobî û homofobî ji hêla hevpeyvîneran ve wek xalên cudabûnê yêni pêwîst hatin nixirandin. Ev cudabûn him bandor li ser tevlihbûna aktorên a koalîsyonan de dike û him jî di çalakîyan de – wek mînak ji ber sloganên – dibe sedema vekîşandinê.

Cudahiyên rêxistinî/sazî

⁵¹ „Kaç tane kadın hareketi [...] genelevdeki kadınların sorunlarını konuşuyor, ya da dinliyor, ya da gidip yüzleşiyor“

⁵² „kadın mal mıdır ki pazarlanıyor“

⁵³ „Fuhuşa sürüklenme gibi sıkıntılarımız var“

Di bin sernivîsa cudahiyên rêxistinî/sazî de li gorî encama analîzên hevpeyvînên bi pisporan re, projetî, bi sazîyên giştî re hevkarî, têkiliyên bi partîya rayedar AKP û bi partîyên siyasî yên din re û hevkarî/koalîsyona bi mêran re wek mijarên cudakir û nîqaşê derketin holê.

Projetî

Di hevpeyvînan de di bin sernivîsa cudahiyên rêxistinî/sazî de projetî an jî femînîzma projetiyê⁵⁴ wek mijareke ji hev cuda dike, tê destgirtin û li gelek herem û deverên ku lêkolînên qadan lê hatin çêkirin, tê nixandin (wek mînak li Trabzonê Üst 2015: 2-14; li Denizliyê Karakış 2015: 45, li Enqerê Anonim 2014: 21). Nîqaşa derbarê projetiyê bi beranberê pêvajoya derbasbuyîna ji tevgera jinan ber bi sazîyên civakî ve û girêdayî hevdîtinên derbarê endamtiya Tirkiyê bi Yekitiya Ewropayê (YE) ve zêde dibin. Li gorî ji Zanîngeha Enqerê Serpîl Sancar projetî pêvajoyekî guhertinê ye, ku ji sala 1980'an vir de ye tevgerên femînîst tê de ne. Li gorî Sancar bi pêşketina sazîbûnê û bi avabûna ku wek femînîzma projetiyê tê bi nav kirin, çalakkûna femînîst bandora xwe ya li kolanan wenda kir (Sancar 2015: 32). Li gorî Sancar dema ku tevgerên jin li ser esasa projetiyê de dimeşin, her yek xwe dikişîne kunca xwe û di çarçoveya mijarên projeyê de kar û xebatên xwe didomînin û bi hêsanî nikarin werin cem hev (Sancar 2015: 32). Sancar femînîzma projetiyê wek meylekî ku ne tenê li Tirkiyê herweha li dinê jî xwe belav dike dinirxîne, li gorî Sancar, da ku encamên projeyan bîna şopandin pêvajoyeke nû derdikeve holê: Şopandin (Sancar 2015: 32).

Li gorî Reyhan Atasü Topçuoğlu ji Zanîngeha Hacettepê, bi hatina projeyên Yekitiya Ewropayê li Tirkiyê nîqaşên „femînîzma salonan“ destpê kirin (Atasü Topçuoğlu 2014: 49). Li Enqerê ji jinên Malên Gel *Halkevci Kadınlar* Sevinç Hocaogulları dest nişan dike ku her çiqas di pevajoya ketina Tirkiyê ya Yekitiya Ewropayê de nîqaşên li ser rêxistinbûna xweyî ya nav tevgerên jinan û bi hêza xwe tekoşîn meşandin cudabûnekê dernexistibe holê jî, di nav sazîyên wan de ev yek gelek hatiye nîqaş kirin (Hocaogulları 2014: 20). Ji Akademiya Jinan a Diyarbakirê Figen

⁵⁴ Femînîzma projetiyê, têgeheke ku di çarçoveya tekoşîna politikayên zayenda civakî de ji bo projeyên ku ji hêla hin rêxistinên jinan ve bi alîkariya fonên derve tînin li darxistin, -bi rexnegirî- tê bikaranîn. Li gorî Deniz Kandiyotî di çarçoveya „ketina tevgera jin a pevajoyekê apolîtîk û teknokratîk“ de „femînîzma projetiyê ji aliyekî de bi alîkariya fonên ji derve û hundir ve xurtbuyîna jinan bi nêzikatiyeke bazarî digire dest, ji aliyê din de jî gelek derfetên aboriyê jî dide dest jinên bajarî û xwendekar, ku ew karibin xwe bigihînin jinên derveyî xwe, ên nexwenda, feqîr û etnikên cuda.“(Kandiyoti 2015)

Aras jî raman û rexneyên xwe yên di warê ragêsiya navbera projetî û hêza xweyî weha tîne ziman:

Wek mînak em sazîyên ku herdem proje çêdikin, xwe li ser projeyan dimeşînin rexne dikin. Ango bi rastî divê em hêza xwe derxînin holê. Li ser projeyên ku ji Ewropayê tîne, sîya neolîberalîzmê heye. Her tim [...] pere tê û hûn [heta ku] pere tê kar dikin. Lê di karê ku tê kirin de girêdanbûnekê heye. Ango ger pere were kar heye, ger pere nêy kar tune ye. Lewre jî em bi guman nezîkî projeyên Yekîtîya Ewropayê, an jî gelek projeyên din dibin. Mînak gelek pêşniyarîyên projeyan tîne vê sazîyê, em napêjîrînin. Mirov dikare, em dikarin pênc perwerde, se ankêt çebikin, projeye bi awayekî tijî bikin, lê belê em van projeyan di derxistina hêza xweyî de wek xetereyekê mezin dibînin. Mînak dîsa li hemberî tevgerên jinan, ku bi alîkarîya Walîtiyê dimeşin, gotinê xwe nabêjin, bi tirs [nêzîk dibin] jî rexneyên me hene. Ne ku em hemuyan red dikin û digirin datînin hemberî hev. Lê di van xebatan de nasnameya jinê dernakeve holê, renga wê dernakeve holê, îradeya wê dernakeve holê. Em bi baldar nêzik dibin. (Aras 2015: 12)⁵⁵

Projetî ligel xetereyên girêdayîbûna fîransî, bi taybetî ji ber sedema girêdayî projetiye li ser lingan sekinandin tekoşîna serbixwe ya jin û zayendî jî dixê nav xetereyê. Aras di vê çarçoveyê de ne pêşxistina projeyan, lê girêdayîbûna bi fîransmanê wek pirsgerêk dibîne. Projetî di heman demê de bandoreke neyinî li ser nasnameya xweyî û xuyakirinê dike. Ji Trabzonê Pelîn Şirin jî wekî Aras tîne ziman, proje çavkaniya dahatinê jî bi xwe re tîne û ev jî dibe sedemê girêdayîbûna fîransî û herweha ev yek di navbera tevgerên jinan de dibe sedema dubendî û xitimandinê (Şîrîn 2015: 23). Li gorî Şirin sedema xitimandinê û girêdayîbûnê ji komên nayên pejirandin, proje girtin e. Ji Diyarbekirê ji saziya LGBTI Hebûnê Öykü jî tîne ziman ku hin tevgerên jinan ji bo îstîhdamkirina xwe projeyan çêdikin û li gorî projeyan jî rojeva xwe

⁵⁵ „Mesela sürekli proje yapan, sürekli projeler üzerinden kendini var eden kadın kurumlarını eleştiriyoruz. Yani aslında özgücümüzü açığa çıkarmamız gerekiyor. Avrupa'dan gelen projelerde de aslında neoliberal bir politikanın yansıması var. Hep [...] para geliyor ve siz o para geldikçe iş yapıyorsunuz. Ama yapılan işin kendisinde de bir bağımlılık var: Yani para gelirse iş var, para gelmezse iş yok. O yüzden mesela biz Avrupa Birliği projelerine ya da birçok projeye de temkinli yaklaşıyoruz. Mesela bu kuruma çok proje teklifi geliyor, reddediyoruz. Yapılabilir; beş eğitim yaparız, üç tane anket yaparız, projeyi bir şekilde doldururuz ama benim kendi özgücümü açığa çıkarmamda çok büyük bir tehlike olarak görüyoruz projeleri. Ya da işte valiliğin desteği ile yürüyen ama sözünü hep sakınan, temkinli, kadın hareketlerine de eleştirilerimiz var. Yoksa tamamen yok saymak, karşılaştırmak temelinde değil elbette. Ama kadının kendi kimliği açığa çıkmıyor, kendi rengi açığa çıkmıyor, kendi iradesi açığa çıkmıyor bu tür çalışmalarda, buna dikkat ediyoruz yani.“

dadigirin (Arif û yê din 2015: 150). Dîsa aktîvîstekê ji Komeleya Destên bi Hine Kınalı Eller Kadın Derneği ya li herema Dîyarbekirê balê dikişîne ser nîvçemayîna projeyan, an jî negihîştina wan a encamê (Anonîm 2015: 32- 34). Li gorî vê aktîvîstê ger navbera komeleyan de parvekirina agahiyan hebe, komên ku di beşên cuda de dixebitin dikarin ji hev re bibin alîkar (Anonîm 2015: 32- 34). Tevgerên jinan di bin hin parametreyan de di proje, qad û çalakîyan de ji bo xebata hevpar amade bin jî, hin kom naxwazin mercên wan ên xebateke serbixwe bikevin nav xetereyê.

Her çiqas di mijara projeyê de bi hêza xweyî meşandina xebatan xaleke girîng be jî, di xebatan de xwedî polîtîkayê serbixwe bûn jî wek dîtinekê derdikeve pêş. Aktîvîstekê ji Kolektîfa Sosyalîst Femînîst SFK ya Enqerê di çarçoveya armancên SFK de derxistina Kovara Polîtîkayên Femînîst a serbixwe bi vî awayî tîne ziman:

SFK di esasa xwe de ji zîlamê, sermayeyê û ji dewletê serbixwebûnê hedef digre. Ji xwe ji destpêkê ve, beyî ku [em] ji projeyekê an jî ji sazîyekê pere bistînin, him kovarê dimeşînin, him jî em dê çi bikin bi hêza xwe dikin (Anonim 2014: 20- 21).⁵⁶

Ji alîye finansî ve xweserîtî, li ser esasa hêza xwe xebat meşandin ji bo gelek nunerên tevgerên jinan mijareke gelek girîng e.

Bi sazîyen dewletê re hevkarî

Di mijara bi dewletê an jî sazîyen dewletê re hevkarîyê de aktorên tevgerên jinan ên li Tirkiyê xwedî nêrînên cuda ne. Aktîvîsta LGBTI ji Enqerê KAOS GL Seçin Tuncel balê dikişîne ser sazîyên jinan ên ku (minak weqf) bi sazîyên dewletê re kar dikin, bi qasî tevgerên jinan ên ku li kolanan xebatên xwe dimeşînin ne muxalif in (Tuncel 2014: 24). Li gorî Tuncel bi taybetî aktîvîstên jin ên ku bi dewletê re dixebitin an jî tekîliyên wan pê re hene, tengasî û nakokîyên bi dewletê re baştir dibinin. Lewre jî tecrubeyên van aktoran girîng dibîne (Tuncel 2014: 24). Hin aktîvîst jî ligel rexneyên hevkarîya bi sazîyên dewletê, di wê baweriyê de ne ku ev pêvajoyê bê pirsgirêk jî dikare bimeşe. Ji Komeleya Navenda Jinê Jiyana Yaşamê ya bajarê Trabzonê

⁵⁶ „SFK esas olarak erkeklerden, sermayeden ve devletten bağımsız olmayı hedefliyor. Zaten baştan beri hiçbir proje ya da hiçbir kurumdan para almaksızın hem dergiyi döndürüyoruz, hem ne yaparsak kendi gücümüzle yapıyoruz.“

Nurber Gürdal tîne ziman ku; di karên hevbeş ên bi sazîyên dewletê re, ger rastî kesên „bi fehm“, „bi perwerde“, û „xwedî perspektîva jinê“ bîn, hevkarî dikare bê pirsgirêk bimeşe (Gürdal 2015: 46). Ji KAMERA bajarê Diyarbekirê Nebahat Akkoç dibêje ew li gundên bajarên Siirt û Batmanê bi mixtar û meleyan re dixebitin, zîyaretkirina sazîyên dewletê wek mînaekeke bi bandor dinirxîne (Akkoç 2015: 20). Akkoç tîne ziman ku têkîliyên wan ên bi sazîyên dewletê re ne li ser esasa perwerdekirinê an jî hinkirinê ye, zêdetir hevdû guhdar kirin tê esas girtin. Dema mijar kuştinên girêdayî „namus“ û „şidet“ê bin, piştgiriya dibînin û tekîliyê domdar dikare bê meşandin (Akkoç 2015: 20). Li aliye din li gorî Akkoç xebata bi sazîyên dewletê re di nav xebatkarên sazîyan de têgihîştinekê derdixine hole (Akkoç 2015: 20).

Di mînakên hatine dayîn de, tê dîtin ku hin tevgerên jinan di tekîliyên xwe yê bi sazîyên dewletê re bandora xwe ya li ser derdorê fireh kirine û mirov dikare bibêje ku hişyarbûnekê di nav van sazîyan de pêş xistine. Di lêkolînên qadan de, mîna ku di hevpeyvînên pisporan de jî derket hole, li hin hereman (mînak Herema Rojhilata Deryaya Reş, an jî bajarên hin piçûktir û heremên deştî) sazîyên dewletê, dikarin di xebatên civaka zayendî de ji bo pêşxistina hişyarbûnê wek aliyekî hevkar derkevin holê.

Tekîliya bi partîya hikumetê AKP re û bi partîyên siyasî yê din re

Dema ji Zanîngeha Enqerê Serpil Sancar di derbarê projeyê de balê dikişîne ser apolîtîkbûn û teknokratbûna rêxistinên, ku her rêxistin di dawiyê de xwe dikişîne kunca xwe, beramberê wê vê pirsê dike:

Femînîst, parezvanên mafên jinan, di siyaseta fermî, temsîlî de dê çi bikin, ewê sîyasetekê çawa bişopînin? Li hemberî muhafazekarkirina AKP ewê sîyasetekê çawa bişopînin? Pêymanên navnetewî, mafên zagonî yê ku divê hikumet bixe meriyetê, dê çawa bişopînin? Mekanîzmaya girêdayî pêşgirtina li dijî şideta li hemberî jinê, sazbariya mekanîzmaya dewletê dê çawa pêk bînin?(Sancar 2014: 36)⁵⁷

⁵⁷ „Feministler, kadın hakları savunucuları, formal temsili siyasette ne yapacaklar, nasıl bir politika izleyecekler? AKP'nin muhafazakârlaşmasına karşı nasıl bir politika izleyecekler? Devletin uygulamayı vaat ettiği uluslararası sözleşmeler, yasal hakları nasıl izleyecekler? Kadına yönelik şiddetin önlenmesiyle ilgili mekanizmayı, devlet

Di şopa van pirsan de aktîvîst û akademîsyenên ku bi wan re hevpevîn hatibûn çêkirin, di derbarê tekîliyên bi partîya hikumetê AKP û partiyên siyasî yên din de dîtînen cuda anîn ziman. Bi giştî dikare bê gotin ku hin aktîvîst tekoşîna jinê ya serbixwe derveyî partiyên dibinin, hin jî bi komên ku bi partiyên re tekîldar in re, di hin mijaran de xebat meşandinê heta astekî weki pirsgirêk nabînin. Ji bo hin koman jî muxalefeta li hember partîya hikumetê AKP ji bo serxwebuna tekoşîna jinê tiştekî gelek pêwîst e. Dema hin aktor destekê bidin partiyeke siyasî an jî nunertiya partiyekê bikin, wê demê ev ji bo nehevkarîya tevgerên jinan dibe sedemêkê.

Li gorî Aksu Bora, ji Kovara Amargiyê, aktorên nav tevgera femînîst di nav erdnîgariya Tirkiyê de him fîzîkî/bedenî him jî beşerî „xwe li ku bi cîh dikin girîng e.“ (Bora 2014: 24) Ji bo hin kesan dijberiya AKP rojeveke girîng e û ji bo muxalifbûne jî esas e. Lê belê ji ber ku AKP esas girtin rast nayê dîtînen, ev yek ji bo Amargî derbas nabe (Bora 2014: 24). Ji Navenda Jinan Kardelenê ya bajarê Dîyarbekirê Mukaddes Alataş tîne ziman ku ew di mijarên zagonên ku AKP derdixîne, an jî diguhure de bi hin komel û sazîyên jinan re lihev nakin. Lewre komên ku piştgiriya desthilatdariyê dikin, alîkarên sisteme ne û naxwazin li hemberî van polîtîkayan derkevin. Ji ber vê sedemê jî nakokî û cudabûn çêdibin (Alataş 2015: 21). Ji Partîya HDP ya Trabzonê Pelîn Şirin, her çiqas xebateke hevbeş bi şaredariya AKP an jî sazîyeke dewletê re, Walî re bi awayekî neyinî binirxîne jî, ji bo peşkeş kirin û bi destxistina daxwazan û nîşandana seknekî berxwedêr vê hevkarîyê pêwîst dibîne (Şirin 2015: 23). Di dema pêkhatina hevpeyvînan de hat ziman ku li bajarê Denizliyê Meclîsa Jinan a Konseya Bajêr bi şaredariya AKP re bê pirsgirêk xebat û bernameyên xwe dimeşînin. (Özen û yên din 2015: 45- 47). Li gorî nirxandinan û seknên cuda yên tevgerên jinan li Tirkiyê, di mijara AKP hevkar (ne)dîtînen de mirov nikare behsa nezîkatiyeke gelemperî bike.

Ji Meclîsa Jinan a Konseya Bajarê Denizliyê Bilsen Özen tîne ziman ku dema sîyaset dikeve nava meselê, tevgerên jinan belav dibin. (Özen 2015: 83- 93). Hemî beşdarvanên qadên lêkolînê mijara partiyên siyasî wekî faktorekî cudakir tînin ziman. Li gorî Sema Kendirici Uğurman, ji Yekîtiya Jinên Tirk a bajarê Enqerê di kîjan partiyê de be bila bibe, aktorên ku di nav partiyên siyasî de tekoşîna jinê dimeşînin, ji pirsgirêka jinê dûr dikevin, „pê bawer nekin jî“ ji derveyî programa partiyê neaxifin (Kendirici Uğurman 2014: 29). Li gorî Kendirici Uğurman

mekanizmasının işlerliğini nasıl sağlayacaklar?”

III.3.A. Polatdemir - Mijarên cihêkirin û yekkirinê

ev cudatî ji sekna polîtîk tên (Kendirici Uğurman 2014: 29). Li gorî Arîf, ji *Hebûna* bajarê Dîyarbekirê, jî beşên jinan ên partîyên siyasî nikarin ji partîyan azad bifikirin, polîtîkayen wan partîyan dimeşînin (Arif û yê din 2015: 46).

Li gorî Şahînde Yavuz, ji Zanîngeha Teknîk a bajarê Trabzonê, wekî ku di çalakîyên kurtajê de jî derketiye pêş, tevlibûna rêxistinên jinan ên beşên partîyên siyasî gelek girîng e (Yavuz 2015: 25). Ev yek dikare bibe sedem ku partîyên muxalefetê (di rexnekirina hikumetê de) li ser tevgerên jinan „prîm berhev bikin.“ Aktorên ku tevî çalakîyan dibin, bi politîkîyên van partîyan re ne eleqedar bin jî, wekî destegirên wan tên dîtin (Yavuz 2015: 25). Yavuz tîne ziman ku ev yek zêdetir di pêvajoya hîlbijartinan de tê şopandin (2015: 25).

Li Artvîn Hopayê femînîsta sosyalîst a ji ÖDP Nefise Yenigül jî di hevpeyvîna xwe de dest nîşan dike ku, dema jinên ku di nav partîyên siyasî de bi awayekî aktîf cîh digirin, nasnameya xwe ya siyasî li alîyekî dihêlin û tevî çalakîyan dibin, ev yek ji bo tekoşîna hevkar a bi rêxistinên sîvîl ên jinan re gelek girîng e (Yenigül 2015: 15). Li herema Artvîn Hopayê hin xebatên ji bo tevgerê serbixwe a jinan çêbûbin jî bi serneketîye. Li gorî Yenigül sedema vê rewşê li dijî bajarên mezin, kêmbûna cîherengî û aktîfbûnê ya li herema Hopayê ye, ligel cîherengiya bisînor lê dîsa jî saziyên jinan tên gel hev (Yenigül 2015: 15). Ji ber vê yêkê jî bandora rêxistinên jinan ên ku di derbarê jin û civaka zayendî de tekoşîna dimeşînin, beyî girêdayî bajarê piçûk an jî mezin, zêdetir li gori hêz û kapasîteya tekoşîna wan a qadê diguhere.

Li gorî femînîsta radîkal Figan Erozan, ji Komeleya Piştigiriya bi jinan a Bodrumê, partîyên siyasî naxwazin ku endamên wan ên aktîf bi tevgerên jinan re bikevin tekîlîyan. Li gorî Erozan sedema vê yêke ew e ku tevgerên jinan daxwaz dikin ku beşa jinan a nav partîyan ji jinan re were hiştin (Erozan 2015: 2). Ji ber ku Erozan partîyên siyasî wekî saziyên zilaman dinirxîne, li gorî wê jinên ku di partîyan de dixebitin mîna şax tên dîtin:

Lewre jin li wir ji bo xwe polîtîka nameşînin, di pevajoya pejiîrandina polîtîkayên heyî de [...] dibin amûr. [...] Gelo ev nikare were guhertin? Ger li kolanan tevgerê jinan a xurt hebe, polîtîka, jîyan û gotinên jinên di nav

wan partiyan dikare bê guhertin. Lê belê ev jî di destê me de ye, ger ew hêza serbixwe tune be, zilam dest datîne ser gotinê. (Erozan 2015: 10)⁵⁸

Li gorî daxuyaniyên Erozan ji bo guhartinê hêzeke jinan a serbixwe gelek girîng e û pêwîst e. Dîsa têkiliyên serdestiyê yên di nav partîyan ku li ser esasa desthilatdariya zilam dimeşin, dikarin bi riya tekoşîna tevgerên jinan werin guhertin. Bi awayekî din, wekî ku Erozan jî balê dikişîne ser, ger tevgerên jinan ên serbixwe di bin çî navî de dibe bila bibe, çiqas bi hêz be, pozîsyona jinan a di nava partîyên siyasî de jî ewqas xurt dibe. Çavkanîya hêzbûna jinên nav partiyan siyasî tevgerên jinan ên serbixwe ye. Ev jî bi mijareke din a nîqaşê, bi zilaman re hevkarî an jî koalîsyon, ve girêdayî ye.

Bi zilaman re Hevkarî/ Koalîsyon

Yek ji mijara di bin sernivîsa cudahiyan rêxistinî/sazî de ku di navbera tevgerên jinan de ramanên cuda derdixîne holê jî mijara bi zilaman re koalîsyon û di navbera rêxistinên tekêl zayendî de tekoşîna jinê meşandin e.

Li gorî aktîvîsta rexistina xwendekarên femînîst a bajarê Enqerê KIPS'ê (Kadınlar Israrla Politik Sahada-Jin bi rik li qada polîtîk in) di navbera di nav rexistineke têkel zayendî de xwe rêxistin kirin an jî vê avasaziyê bi temamî red kirin de nêrîneke gelek cuda heye (Anonim 2014: 38). Çalakîyên 8'ê Adarê dikarin ji bo nîqaşên derbarê hevkarîya bi rêxistinên têkel zayendî wek mînak werin nîşandan. Ji jinên Malên Gel *Halkevci Kadınlar Sevinç Hocaogulları* ev mijar di nav derdorên çepgirt de çawa tê meşandin, weha bilêv dike:

Neha êdî hat derbas kirin lê [...] di platforman de bi qasî deh salan nîqaşên 8'ê Adarê de gelo bila tenê jin tevî bibin an mêr jî dikarin tevî bibin, hatin kirin. Mînak neha bi tevîbûna jinan tê rexistin kirin. Lê hin jî hin deverên ku ev nîqaş berdewam dike, hene. [Wekî mînak]“[...]na, di rastiyê de divê gere têkel be, lewre [...] xelasbûna jinan bi xilasbûna kedê ve girêdayî ye, ji bo vê jî tekoşîneke hevpar pêwîst e.“ [...] Gelo tekoşîna jinan dê serbixwe be, an

⁵⁸ „Dolayısıyla orada kadınlar kendileri için politika üretmiyorlar, var olan politikanın içselleştirilmesi sürecinde [...] araç oluyorlar. [...] Bu dönüştürülemez mi? Sokakta güçlü bir kadın hareketi varsa, o kadınların o partiler içindeki yaşamları ve politikaları, sözleri dönüştürülebilir. Ama o da bizden geçiyor çünkü o bağımsız yapılanma yoksa söze el koyan erkektir.“

[...] bi giştî parçeyê tekoşîna sosyalîzmê be, wek berê nîn be jî, hîn jî di bin de tê meşandin. Wek mînak rêxistinbûna jinan a serbixwe, baweriya bi tekoşîna serbixwe a jinan, dibe ku xala cudabûnê be Em difikirin ku li wir tekoşîna jinê divê di qadên serbixwe de bê meşandin. Ger di nava rexistineke têkel de be jî, li gorî me divê ji bo bihêzkirina pêvajoya kirdebûna jinê, derfetên afirandin û divê rêxistinên têkel, rêxistinên kedê li gorî naskirina xweseriya tekoşîna jinê bêt sazî kirin. (Hocaoğulları 2014: 20)⁵⁹

Li gorî Hocaoğulları xweserbûna rexistinê jinan di nava rexistinên têkel, ji bo pêşxistina derfetên rê û rêbazên kirdebûna jinan û ji aliyên rexistinên têkel ve naskirina wan gelek girîng e (Hocaoğulları 2014: 20).

Ji komeleya Piştgiya bi Jinan a Bodrumê Erozan jî tevlibûna zilaman a çalakîyên ku bi munesebeta 8'ê Adarê û kuştina Özgecan Aslan⁶⁰ hatin lidarxistin bi zimanekî tund rexne dike. Li gorî wê jin ji bo xwe çalakî li dar dixin û çalakîyên ku jin bidest xistine û pêk anîne hene. „[Em] bê zilam çalakî lidar dixin, lewre yê ku em li hember tekoşînê dimeşînin, hedefa ya hemberî we zilam e. Lewre zêdehiya vê sîstemê di destê wî de ye.“⁶¹ (Erozan 2015: 12) Li gorî Erozan tevlibûna zilaman a çalakîyên ku jin aliyên jinan ve tînd lidarxistin, tê wateya valakirina naveroka wan çalakiyan û dest nişan dike ku wek prensîbeke polîtîk a bêtîqaş bi zilaman re li kolanan nayê derketin (Erozan 2015: 12).

Di hevpeyvînên pisporan de wek sedemên hemberî hevkarîya bi zilaman re bi giranî du xal derdikevin pêş. A yekemîn de perspektîfê gelek radîkal heye. Li gorî wê nerînê, zilam obje ne

⁵⁹ „Şimdi aşıldı sayılır ama [...] 8 Mart'ların yalnızca îndinkadınların mı katılacağı, karma mı yapılacağına dair neredeyse bir 10 yılı bulan tartışma yürütüldü kadın platformlarında. Şimdi mesela kadınların katılımıyla örgütlenmiş oluyor. Ama hala bu tartışmanın güncel olduğu yerler var: „[...] Hayır aslında karma olması gerekir çünkü [...] kadınların kurtuluşu emeğin kurtuluşuna bağlıdır, onun için de ortak mücadele gerekir“ gibi. [...] Kadın mücadelesinin bağımsız mı olacağı, yoksa [...] genel olarak sosyalizm mücadelesinin bir parçası mı olacağı eskisi kadar güncel veya popüler bir tartışma olmasa da aslında alttan alta yürüyor. Mesela bağımsız kadın örgütlenmesi, bağımsız kadın mücadelesine olan inanç veya ihtiyaç bir ayrışma noktasıdır belki. Biz orada kadın mücadelesinin bağımsız kanallarda yürütülmesi gerektiğini düşünüyoruz. Karma bir örgüt içinde olsa bile kadın örgütlenmesinin özerkliğinin, yani kadınların kendi özleşme sürecini güçlendirecek kanalların yaratılması ve karma örgütlerin, emek örgütlerinin, kadın mücadelesinin özgünlüğünü tanıyacak biçimlerde işlemesi gerektiğini düşünüyoruz.“

⁶⁰ Xwendakara Zanîngehê, ku di 11 Sibata 2015'an de li navçeya Tarsusê ya bajarê Mersînê ji ber ku li hemberî tecewuza ajokêrê Minibusê li berxwe da, hat kuştin.

⁶¹ „Erkeksiz eylem yaparlar çünkü bizim mücadele ettiğimiz birebir karşınızdaki hedef erkektir. Çünkü bu sistemin artışı onun elinde.“

û li hemberî wan tekoşîn tê meşandin. Li ser vî esasî eniya ku li hemberî wê tekoşîn tê meşandin, nikare bibe hevkarê koalîsyonê. A duyemîn jî zêdetir girêdayî çalakîyan tê şîrove kirin. Li gorî vê, li cîhên ku çalakîyên tevgerên jinan lê tên kirin, divê êrîşên zilaman neyê jîyan kirin. Ev jî tenê bi çalakîyên bê zilam dikare pêk were.

Ji bo mînakê duyemîn ji Soropîmîstên bajarê Denizliyê Jülide Keleş Yarışan tîne ziman ku çalakî û pêşwazîyên bê zilam derfetên baştir ji bo tekoşînê derdixînin holê. Dîsa li gorî Keleş Yarışan jin hêsantir dikarin bikevin nava van tekoşînan, guman nakin ka „ji ku derê dê pêşa me bê kaş kirin.“ (Keleş Yarışan 2015: 14)⁶² Li alîye din dîsa Jülide Keleş Yarışan tîne ziman ku çalakîyên GÎKAD'ê yên bajarê Denizliyê ku têkel tên li dar xistin, di aliyê civaka zayendî de hişyarbûnekê derxistiye holê (Keleş Yarışan 2015: 14).

Ji Komeleya Jinan a Selîsê ya bajarê Dîyarbakirê Zîn û Emek, balê dikişînin ser perwerdeyên civaka zayendî yên ji bo zilaman, ku ji hêla Tevgera Jinên Kurd ve, bi armanca „pêşketina nêzikatiya rexneyî û guhertina helwesta li hember jinê“⁶³ tên li darxistin (Zîn û Emek 2015: 46). Ji akademîya jinan a bajarê Diyarbakirê Fîgen Aras zilaman wek „desthilatdarên piçûk ên li ser serê me“⁶⁴ pênase dike û dibêje zilam ligel „rêhevaltî“ û „hevaltiyê“ dîsa jî xwe her daim wekî zilam îfade dike (Aras 2015: 36- 42). Ji ber ku zilam ji ber xwe „dev ji desthilatdarîya xwe bernadin“⁶⁵, divê jin ji bo vê guhertinê bibin hêzekê bi bandor. Li ser vê esasê ew „perwerdeyên xweser ji bo jinan“⁶⁶ didin (Aras 2015: 36- 42). Di vê xalê de jî tiştê herî balkêş ne hînkirin, lê parve kirin e. Di van perwerdeyan de hatiye dîtin ku zilam „di pratîkê de zahmetiyan“⁶⁷ dikişîne, lê dû re beşdarvan zilamtiya sîstemê fêm dikin (Aras 2015: 36- 42).

Ji Komeleya Jinan a Destên bi Hinekîrî *Kımalı Eller Kadın Derneği* ya bajarê Diyarbakirê aktîvistekê tîne ziman ku di tekoşîna hemberî pirsgrêka jinê de divê „zilam jî bê zane kirin“ ji bo vê jî di projeyên xwe de zilaman jî wek koma hedefkirî dibînin (Anonim 2015: 21).

⁶² „eteğimizi nereden çekiştirirler“

⁶³ „özeleştiril bir yaklaşım kazanmaları ve kadına bakışlarında değişiklik yaratmak için“

⁶⁴ „küçük egemenler gibi başımızda“

⁶⁵ „kendi egemenliklerini bırakmak“

⁶⁶ „özgün kadın eğitimleri“

⁶⁷ „pratiklerinde bir zorlanma“

Li gorî Aksu Bora, ji Kovara Amargiyê, ji hêla tevgerên jinan ên Tirkiyê de bi giştî meseleya têkiliya bi zilaman mijareke nîqaşê ya gelek mezin e (Bora 2014: 24). Bora tîne ziman ku wan demeke direj cih nedaye nivîsên zilaman û bi mînaka niviskarekî trans balê dikişîne ser „mijara zayendiyê [ku] bi hêsanî nayê fêhm kirin.“ (Bora 2014: 24)⁶⁸

Di nirxandina hevpeyvînan de derdikeve holê ku hevkarîya bi zilaman re ji bo tevgerên jinan ên Tirkiyê mijareke gelek bi nîqaşên mezin e. Helwest nikarin bi awayekî zelal werin kategorize kirin. Di encamê de dikare bê gotin ku hevkarîya bi zilaman re di rewşên cuda de dîsa tê nîqaş kirin û li ser tê axaftin.

1.2 Mijarên dikin yek

Ligel xalên cudahiye yê tevgerên jinan li Tirkiyê, ku di beşa din de li gorî encamên nîqaş û hevpeyvînan pisporan de hatin şîrove kirin, tevgerên jinan ên Tirkiyê him li tevahîye welêt, him jî li qadên ku lêkolîn lê hatin kirin, di qadên tekoşînê yê hevpar de digîhîjin hevdû, bi hevkarî di çarçoveya wekheviya zayenda civakî de polîtîkayên zayenda civakî û jinê digirin dest.

Mirov dikare bibêje ku xeta tekoşînê ya herî pêwîst a tevgerên jinan, ku di navbera wan de yekitî û hevkarîyê xurt dike, mijara hevpar a hemû tevgerên jinan, **şîdeta li hemberî jinê** ye. Li gorî Pelîn Kalkana ji Kolektîva Femînîst a bajara Enqerê „di tevgera jinan de mijarên ku hemû li ser yek dibin, bi gelemperî mijarên gelek acîsker, nexweş û li ser şîdetê ne.“ (Kalkan 2014: 25)⁶⁹ ji Uçan Süpürgeyê Selen Doğan li gorî çavdêriyên xwe tîne ziman ku şîdet û mijarên giredayî wê wek qadên bertekên hevpar tên dîtin:

Ez behsa şîdeta klasîk dikim, lêdan, destavêtin, kuştin, kuştina jinan, kuştina ji bo ‚namuse‘, û hwd. Di van hemûyan de tevgerên Jinan ên cuda dikarin bîna cem hev û tîna cem hev. (Doğan 2014: 38)⁷⁰

⁶⁸ „cinsiyet meselesinin o kadar basit kavranabilecek bir mesele“

⁶⁹ „Kadın hareketinde, tüm herkesin ortaklaştığı konular genellikle çok can sıkıcı, tatsız ve genellikle şiddet çerçevesinde dönüyor.“

⁷⁰ „Klasik anlamda şiddetten söz ediyorum, dayak, tecavüz, öldürme, kadın cinayeti, ‚namus‘ cinayeti vs. gibi. Bütün bunlarda farklı kesimlerden kadın örgütleri bir araya gelebilir, gelebiliyor.“

Ji komeleya Jinan a Karyayê ya bajarê Muğlayê Dilek Bulut mijara şîdeta li dijî jinê ji bo tevgerên jinan ên Tirkiyê weki „qada têkiliyê“ dibîne:

[...] Kuştina jinan gihîşt asteke gelek xofane. Ji bo wê jî tekoşînên jinan ên ku li ser vî mijarî tên meşandin, gelek bihêz in û li wê derê ez vê jî dibînim: Êdî mirov xwedî li kuştinên Kurd, Tirk, Femînîst, Lezbîyen, LGBT jî derdikevin. Xuya ye ku mijara şîdetê û mijara kuştinê yekane xala ku tevgerên jinan tîne cem hev e. (Bulut 2015: 27)⁷¹

Derveyî van gotinan jî gelek aktîvîstên ku bi wan re hevpeyvîn hatibûn çêkirin, didin diyar kirin ku di mijara şîdeta li hemberî jinan de tevgerên jinan ên cuda – herî kêr di nîşandana bertekê de – nêzikatîyên xwe yê îdeolojîk datînin alîyekî û bi *mîsoger* tîne cem hev (mînak: Başak 2014: 48; Doğan 2014: 38; Hocaogulları 2014: 20; Kalkan 2014: 21-25; Sancar 2014: 34; Akkoç 2015: 57; Aktaş 2015: 13; Alataş 2015: 21; Arduç û yê din 2015: 29; Arif û yê din 2015: 22; Balkanay 2015: 37- 42; Bulut 2015: 27; Can 2015: 22; Eren 2015: 18; Karakuş 2015: 35; Zin û Emek 2015: 48). Şîdeta li hemberî jinan, ku wek sernivîsekê tevgerên jinan ên cuda tîne cem hev, di hevpeyvînen pîsporan de bi van awayan tê ziman: „Lêdan, destdirêjî, kuştina jinan, kuştina ji bo ‚namusê‘ “ (Doğan 2014: 38), „şîdeta nav malê“ (Vayiç Aksu 2015: 19), „dijminatîya jinê“ (Kenanoğlu 2015: 33), „qirkirina jinan“ (Anonim 2015: 94- 95), „daxwaza malên parastinê“ (Çağlayan, 2014: 32).

Sernivîseke din a ku derveyî şîdeta li hemberî jinê, tevgerên jinan tîne cem hev, **tekoşîna jinan a ji bo mafên jinan û girêdayî vê tekoşîna li hemberî statuya jinê wek zayenda duyemîn** e. Li gorî Aksu Bora ku ji Enqerê tevî hevpeyvînan bibû „femînîst an jî ne femînîst, [xalê] ku hemî jinan dike yek, agahiya derbarê duyemînkirin, bînpêkirina jinê ye.“ (Bora 2014: 24)⁷² Li gorî Güler Can, ji Ajansa Nûçeyan a Jinê JINHA’yê ya bajarê Dîyarbakirê, „tiştê ku ji bo tevgerên jinan hevpar e, [ew jî] dîtina jinan a wek zayenda duyemîn e“⁷³ û „vê zîhniyetê binxistin û [tekoşîna]

⁷¹ „[...] Kadın cinayetleri çok vahşileşti. Onun için bu konu üzerinden örülmüş kadın mücadeleleri çok güçlü gidiyor ve orada şunu da fark ediyorum: Kürt, Türk, feminist, lezbiyen, LGBT cinayetlerini de insanlar sahiplenmeye başlıyorlar. Yani şiddet konusu ve cinayet konusu herhalde Türkiye kadın hareketinin tek birleşme noktası gibi görünüyor.“

⁷² „feminist olanlar ve olmayanlar hepsini birleştiren [unsur] kadınların ikincilleştirilmesi, ezilmekte olduklarına dair bir bilgidir.“

⁷³ „kadın hareketleri için ortak olan şey kadının aslında ikinci sınıf bir cins olarak görülmesi“

ji bo mafên jinan⁷⁴ xala hevpar a hemî tevgerên jinan e. (Can 2015: 22).

Mijareke din ku gelek tevgerên jinên cuda tîne cem hev **jî ketina nav jiyana kar û di jîyana kar de bicîhkirin/îstîhdamkirina jinan e**. Mînak ji Komeleya Parastina Mafên Jinan a bajarê Denizliyê Nurten Karakış û ji Komeleya Piştgiriya bi Jinê ya Deryaya Reş Nilüfer Akgün dibêjin di mijara îstîhdamkirina jinê de tevgerên jin tîne cem hev (Karakış 2015: 17; Akgün 2015: 20). Ji milê jinan a AKP ya bajarê Trabzonê Emine Altundaş, kûrsen hewldanên karsaziyê ji bo îstîhdamkirina jinan wek mînak dide xuya kirin (Altundaş 2015: 14). Pelin Şirin, ku ji Trabzonê tevî hevpeyvînê bibû, mijara „di pêvajoya zagonê de ji bo sererastkirina zagonan, û bidestxistina wan a di pêvajoyên hiquqî de“⁷⁵ di çarçoveya istîhdamkirinê de weke xeteke tekoşînê digire dest (Şirin 2015: 23). Ji Zanîngeha Sıtkı Koçman a bajarê Muğlayê Özlem Şahin Güngör tîne ziman ku bi „xebatên kedê“ di navbera „rexiştinkirina jinên ku di nava malê de dixebitin“⁷⁶ û „-di çarçoveya sendikayan de- di pevajoya kedê de jin“⁷⁷ de hevkarîyekê derdikeve hole (Şahin Güngör 2015: 32).

Zordariyên ku ji aliyê dewletê ve an jî hikumetê ve tîne, di navbera tevgerên jinan ên cuda de reflekseke hevpar dikare pêş bixîne. Ji Komîsyona Mafe Jinan a Baroya Trabzonê Bahar Bostan vê yekê weha tîne ziman:

Di rastiyê de hikumet û dewlet tiştên cuda ne lê belê em neha herduyan di nav hev de dibînin û di her tiştê ku ji aliye dewletê an jî ji hikumetê ve tîne, di pêkutiyê ser jinê û astengkirina qada jiyana jinê de hemu tevgerên jinan dibin yek. Bi taybetî jî dema dewlet mudaxeleya qada me bike, jinên islamîst, jinên Tirk, jinên Kurd, femînîstên sosyalîst, Yekîtiya Jinên Tirk em hemû dibin yek. (Bostan 2015: 18)⁷⁸

Ji Zanîngeha Teknîk a Karadenîzê Şahînde Yavuz jî mîna Bostan balê dikşîne ser pêkhatiyên

⁷⁴ „bu zihniyeti yıkmak ve kadın hakları“

⁷⁵ „yasal süreçte de yasaların düzeltilmesi, bunların hukuksal süreçte kazanımı“

⁷⁶ „ev eksenli çalışan kadınların örgütlenmesi“

⁷⁷ „sendikal anlamda emek sürecinde kadınlar“

⁷⁸ „Normalde devlet ve hükümet farklı unsurlardır ama şu anda biz ikisini iç içe görüyoruz ve hükümetten ya da devletten kaynaklı olarak gelen, her türlü kadına yönelik baskıda ve kadının yaşam alanının daraltılmasına yönelik her türlü şeyde, kadın hareketi birleşiyor. Özellikle bu devletin alanımıza müdahalesi olduğu takdirde İslamcı kadınlar, Kürt kadınlar, Türk kadınlar, işte Sosyalist Feministler, Türk Kadınlar Birliği hepimiz birleşiyor.“

baviksalarî yê hiqûqî û „şîroveyên li gorî kesan“ û dibêje ev tişt canê gelek jinan şewitandiye. Li gorî wê di vê pêvajoyê de hemû jin dikarin dibin yek (Yavuz 2015: 15). Li gorî Nesrin Semiz ji Platforma Jinên Paytextê jî li herema Enqerê „sekna li hemberî hikumete“ hemû tevgerên jinan ên bajarê tîne cem hev û dibe bingeha bihevte tevgerandine (Semiz 2014: 27- 28).

Mijarên wek zewacên zû ku wek „**bûkên zarok**“⁷⁹ **tê dizanîn, tevîbuna jinê ya nav siyasetê, pâymana li hemberî hemu cudakirinên li hemberî jinê (CEDAW), an jî Peymana Stenbolê; pejirandin, pêkanîn û pêşxistinên pêymanên navnetewî, 8'ê Adarê Roja Jinên Cîhanê û 25'ê Mijdarê, Roja tekoşîna navnetewî ya li hemberî şîdeta li ser jine, rojên pêwîst ên di derbarê tekoşîna jinê û zayenda civakî** de li Tirkiyê tevgerên jinan bi awayekî berfireh tîne cem hev. Di çarçoveya hevpeyvînên pisporan de mirov dikare bibêje ku di warê heremî de jî di çarçoveya **polîtîkayên bedenê** de mijarên wek **kurtaj, zayîn, kerrbûn, zayendîtiya jinê** dibin sedema hevkarîya jinan. Van mijarên hevpar, mina ku di qadên lêkolînê de; li bajarên Enqerê, Diyarbakir, Denizli, Muğla, Trabzon û Artîn û navçeyên Hopayê jî weke mijarên koalîsyonê derdikevin pêş. Ev hevkarî di avakirina koalîsyonên tevgerên jinan û di çarçoveya zayenda civakî de ji bo meşandina tekoşîneke hevpar rolekî gelek girîng dilîzin.

Çavkanî

- Kandiyoti, Deniz (2015): Kadın Hakları Açmazda mı? 7 Mart 2015 Konuşması. <http://genderforum.sabanciuniv.edu/tr/deniz-kandiyoti> (05.06.2017).

⁷⁹ Bikaranîna peyva „Bukên Zarok“ ku gelek tê bi karanîn, ji aliyê gelek jin û aktorên ku di sîyasetê zayendî de dixebitin nayê pêjirandin. Ji ber ku kombinyona pêyvên „Bûk û Zarok“ di normên civakî de „Zewacên zû“ dîke rewê û bi awayekî wê dide pejirandin û herweha girêdayî wê şîdeta di nav de vedîşêre.